


H

ikûmeta MGK'ê
bi xwe re
mijara sîstema
hucreyan jî anî. Lewre
di nava biryarên MGK'ê
yên 28'ê reşemiyê de
ev yek jî hebû. Wezîrê
Edaletê yê vê hikûmetê
Ditan Sungurlu bi qasî
pêşrewêñ xwe Mehmet
Ağar û Şevket Kazan
navdar e. Di dema
Mehmet Ağar de li çend
girtîgehan girtî hatibûn
kuştin. Di dema Kazan
de 12 girtî di rojiya
mirinê de şehîd ketin,
10 girtiyêñ welatparêz
î bi awayekî hovane
hatin kuştin. Heke raya
îştî li girtiyan xwedî
bernekeve bûyerên xer-
ubtir li ber derî ne.

RÜPEL 3

**Hevpeyîn:**

Înstîtuya Kurdi dixwaze ber bi
akademîbûnê ve gavan biavêje

Rüpel 8-9

Deham Ebdulfettah:

Tu xebatênu li ser zimanê
kurdî hatine kirin ne tekûz in

Rüpel 4-5

Talabani:

PDK dixwaze têkçûna xwe bi
propagandayê veşêre

Rüpel 15



Salihê Kevirbirî: Rojnameyan û rewşenbirê Kurdistanî Hüseyin Deniz



Azad Altun: Rewşîngiya ji koletiyê ber bi azadiyê: August King



Çiya Mazî: Çend dûrik û metelokên herêma Mêrdînê

Ji Xwendevanan

ZIMAN, hebûna mirov e. Kesê ku zimanê wî nebe, fikir û ramana xwe nikare derxe holê. Mîna zârokekî devê wî tîjî be û nikaribe biaxive. Ez û gelê xwe jî mîna zarokên ber destê jinbavê ne. Em derd û xemê xwe, kûl û kederêne xwe bay nikarin bînin ziman. Ji ber ku ev sed sal e gem li devê me, qeyd li mejîyê me ketiye. Belê bi saya Welat, Welatê Me, û Azadiya Welat, Rewşen, Zend û heçî rojname û kovarén bi zimanê gelê me hatine weşandin pariyezi ez hîni' zimanê xwe bûm.

Hîna ez pir baş hîni' zimanê xwe nebûme. Bo ku ez hîn bibim temenê min tê rînake. Heke ez bi şev û bi roj bixwînim û binivîsim jî, ez dikarim ji deryayekê dilopekê hilînim. Heya niha (beriya niha çarpênc salan) min nizanibû ku em xwedîyê vê deryaya bêbinî ne. Heya niha min nizanibû em xwedîyê çand û huner û tore û wêjeya giran in. Heya niha min nizanibû em xwedîyê dergûşa şaristanî ya gelan, xwedîyê xaka medan in.

Beriya ku min weşanên kurdî nexwendibûn min nizanibû ku ez kî me. Pişti ku bi van weşanen re nasdar bûm, hiş û ramânî min ên zingarî roj bi roj ji qirêj û kevneperestiya hezar salî xwe paqî dike. Ji bo ku xwe paqî bike jî dîsa temenê min ne bes e. Xwe safikirina tahrîbata hezar salan ne hîsan e..

Zimanê me her tiştê me ye!
Bê Welat jiyan nabe!

ADAR JIYAN

W

Kêşaya kurd û kemalist

SAMI TAN

Peyva îdeolojiya resmî ango bi kurdî ya xwerû bîrdoza fermî bi pirtûkên Mamosta Ismail Beşikçi ket nav lîteratûra siyasi ya kurdan. Qet nebe mirov dikare bibêje, bi awayekî berfireh cihê xwe girt. Mamosta Beşikçi da zanîn ku li welatên ku li wan demokrasî tune ye, tê xwestin ku her kes li gorî bîrdoza fermî bifikire; bîr û baweriyêni li derveyî vê bîrdozê bi tundî tê cezakirin.

Wekî qelsiya herî mezin a sîstema sosyalîzma reel kembûna demokrasiyê û hebûna bîrdoza fermî dihat dîtin. Li wan welatan pişti ku germahiya şoreşê li ser gel bandora xwe winda kir. Gel ji rîveberiyê hate dûrxistin, bîr û ramanên rîberên şoreşê bûn dogma û rî li ber pêşveçûnê hategirtin. Di vî tiştî de tu sûcê rîberên şoreşê nîn bû, lewre wan nexwestibû ku bîr û ramanên wan bi awayekî dogmatik bibin asteng li ber pêşveçûnê. Lê bûrok-ratêne berjewendîperest, békêri û sûcênen xwe bi vî awayî vedişartın. Kêmasiya rîberên şoreşê ev bû kû mjeanîzmayen ku rî li ber serdestiya bûrokratan bigirin, nefirandibûn.

Heke mirov vegere ser mijara xwe ya bingehîn, têgiha "bîrdoza fermî" ji ber helwesta dewleta tirk a li hemberî kêşaya kurd hate rojeva me kurdan. Lê bîrdoza fermî ya dewleta tirk ango kemalîzm ku di rastiya xwe de ne bîrdoz bû jî, hê di destpêkê de rî li ser pir-rêngî û pir-deniyê girtiye. Tevgera kemalîstan pişti ku lingê wê baş erd girtiye, berê xwe daye hevalbendê xwe, ew yeko yeko ji holê rakirine. Bîr û baweriyêni kes û rîexistinê ku hatine tasfiyekirin, ji bo kemalîstan qet girîng nebû; ji welatparêzen kurd bigire, heta İslamiyan, komünîstan û hwd.

Tê zanîn ku rîveberen Partiya Komunist a Tirkîyeyê berî her kesî hatin kuştin, lê komünîsten nûhatî payeya antî-imperialîzmî û pêşverûtiyê dan kemalîstan. Vê bîr û baweriyê di navâ tevgera çepgiran de tim ji xwe re alîgir dîtin, niha jî serkêsiya vê baweriyê Doğu Perinçek dike.

Li gorî dîtina Perinçek Amerîka dixwaze li başûrê Kurdistanê dewleteke serbixe ya kurdan ava bike. Lewre ji ew bi hevalbendiya Saddam, Tirkîye û Barzanî geleki kîfîxwês bûye. Li gorî Perinçek bi vê

hevalbendiyê ev plana Amerîkayê têk çûye. Perinçekê ku digot: "Divê mirov sila-vê bide tanqênu ku li dijî olperestan bi rî ketine", niha gîhiştiye wê baweriyê ku li seranserî Tirkîye û bakurê Kurdistanê ji artêşê pêşverûtir kes tune. Balkêş e ku hevalbendiya artêşâ tirk, İsrail û Amerîkayê nayê bîra Perinçek.

Serokê Partiya Karkeran Perinçek içar dest avetiye kêşaya kurd. Ew dixwaze vê kêşeyê li gorî prensibîn Kemal Atatürk çareser bike. Bi vê mebestê salen berê projeyek pêşkeshî Demirel kiribû, lê enamek jê derneketibû. Doğu Perinçek vê projeya xwe jî nû ve tîne rojevê. Li gorî nûcyeke ku roja 31'ê tîrmehê di rojnameya Turkish Daily Newsê de derketiye, wê Perinçek, li ser esasa yekdewletî, yekmeclîsi, yeknasnameyi pirsgirêkê çareser bike. Ji pêşniyaran Perinçek tiştê ku piçekî bêhna çepgiriyê jê reforma erd û zeviyan e. Çarçoveya ku Perinçek daniye, otonomî ye. Tiştê ji wê girîngitir jî ew e ku Perinçek vê projeya xwe digihîne M. Kemal. Li gorî wî M. Kemal jî xwestiye kêşaya kurd bi vî awayî çareser bike. Heke wisa be, mirov tê nagihêje ka ji ber ci sedemê çareseriya kêşeyê hiştîye li hêviya Perinçek? Heke kemalist karibin hingavan di vî warî de biavêjin, ew jî tiştekî baş e, lê ez ne bawer im ku kurd edî statûteyeke ji federasyona demokratik kîmtir bipejîrinin.

Rûmetgirtina bi doza şêhîdan

R. AHMET HESEN

Dîrokê de, gelek serhîdan û raperînê me çebûne. Lê mixabin hemû raperînê gelê me hatine perçiqandin. Bi hezaran zarokên kurdan hatine şehîdkirin.

Cihê şehîdan di dîrokê de pir bilind e, bi girêdana bi ked û berhemên şehîdan re parî hate avakirin. Ceng fireh bû, enî, artêş li dar ket. Lewra şehîd di bingeha jiyanê de Kurdistanê ifade dikin. Yanê eger ku tevgera azadîxwaz a kurd şehîd nedabûna û şehîd nebûna jiyan, ne gençgaz e ku ew bigîhişa vê asta ku iro gîhiştiyê ye. Her tişt di Kurdistanê de bi xwîna şehîdan û bi fikir û ramanên wan hattîye çekirin. Belê, hemû saziyên me bi şehîdan hatine avakirin. Serokatiya tevgera azadiyê li ser şehîdan wiha dibêjê:

"Me şehîd anîn cihêki bi bandor, serwerde û bi hêz. Bi qasî ku me pêşîya jiyana sexte girt, bi teoriya şehadetê jî, careke din jî me ew jîndar kirine. Pêşketin çebûn, me şehîd anîn jiyane, jiyane jî hinek li gorî şehîd çebûn." Bi rastî jî em hêza xwe ya herî mezin ji jiyana şehîdan dirigin.

Şehîd, bûne çavkaniya me ya jiyane. Ew di jiyane de nûneriya kesayetiyeke nû dîkin. Ew lehengîya şehîdan tev bûye stran û tîn li ser zimanê mirovan in. Bi taybetî şehîd bi çalakiyên xwe yênil dila-wer û giranbuha, her gav bûne mînak ji bo me. Vê yekê jî her mirov nikare dî ke-

Ji bo ku bibe layiqî şehîdan divê her mirov, bawerî û vîna şehîdan di kesayatiya xwe de pêk bîne. Girêdayina bi şehîdan pêwist dike ku mirov gotînen wan bike ferman ji bo xwe.

Sayetiya xwe de pêk bîne, ji ber ku bi bawerî û vîna xwe ya pir mezin, qirêjîya hezar salan ku li ser civakê ye bi xwîna xwe paqî kirin. Ên ku li dijî zorê, bare giran danîne ser milen xwe, şehîd bi xwe ne.

Çawa ku mirov dixwaze derbasî bi-hushtê bibe, di ser pira selewatê re dimeşê û ji bo ku nekeve, jê tê xwestin ku di giyana xwe de xwestekê yeşdan pêk bîne, her wisa jî ji bo jiyaneke bi rûmet û pêkanîna, daxwazîn şehîdan tê xwestin ku fikir û ramanê serokatiyê pêk bîne. Di bihushtê de birafî, wekhevî, azadî, serfirâzî heye. Derbasbûna di ser pirê re lehengîyeke mezin dixwaze, ji ber ku her mirin ne wekî hev e, mirin ji hev cuda ne; "mirin heye wekî perikê mirîşkan sivik e, mirin ji heye wek çiya giran e." Yek ji van mirinê giran a lehengîn gel, wekî Mazlum Doğan, Hayri, Kemal, Egît, Berîvan, Berîtan û Zîlan e. Di dîroka berx-

wedanê de di têkoşîna serxwebûna gelê me de xwîna xwe dilop dilop rijandine li ser axa miqades. Şehîdan navênu xwe bi tipen zêrîn di dîroka mirovatiyê da nivîsîne. Dema mirov kesayetiya wan tîne bîra xwe, laşê mirovan li ber heybeta wan diricife.

Şehîden gelê kurd û mirovatiyê mora xwe li rûpelên dîrokê xistine. Dîrok, edî bi xwîna şehîdan hate neqîşkirin. Bû çavkaniya mirovatiyê, ji ber ku serdestan jiyan li çîna karkeran û li gelê me kiribû goristan. Çîna serdest ji bo berjewendîyê xwe her tişt bi serê mirovan de dianî. Li dijî wan xwîmmijan, her livbaziyeke şehîdan mirina komara tirk û hevalbendê wan bû. Şehîdê welatê rojê, bi biryârîyeke xurt û giyaneyeke mezin û rîxistî her demê welat ronahi kirine.

Ji bo ku mirov bibe layiqî şehîdan divê her mirov, bawerî û vîna şehîdan di kesayetiya xwe de pêk bîne. Birdozî û mebesta şehîdan heyani mirinê girêdayîbûn e. Belê girêdayîna bi şehîdan pêwist dike ku mirov gotînen wan bike ferman ji bo xwe. Xwestekênu ku şehîdan di riya wan de canê xwe dane, divê ji me re bibin rînşandar. Ji ber ku iro di Kurdistanê de meşâli derveyî xêza şehîdan bê rûmeti û mirin bi xwe ye. Girêdana bi şehîdan di bilindbûna ser û xurtkirina kesayetiya mirov re derbas dibe. Bêyî serkeftina di xebatê de; ne gengaz e ku mirov behsa girêdana xwe ya bi şehîdan re

KOVARA Almanî ya hefteyî FOCUS, di hejmara xwe ya vê hefteyê de cih da hevpeyîn ku bi serokê gişî yê PKK'ê Abdullah Öcalan re hevpeyînê pêk anîne. Di hevpeyînê de Öcalan nîxandinê xwe li ser operasyona dagirkirina Başûrê Kurdistanê, rewşa Qemî Zapê, helwesta PDK'ê û Şerâfettin Elçi û partiya wî DKP'ê wiha tîne ziman: "Komara tîr, bi helwesta xwe ya dagirkirina başûr bi ser neket û têk çû. Kampa Zapê ji berê bêhtir di bin iñisîyafla me de ye. Pêk hatîna Yekîtiya neteweyî ya kurdan wê li Başûr pêk were. Mesûd Berzani û PDK li hemberî gelê kurd di nav ixanetê de ne. Gelê Başûr ji sedî not aîkarî û piştevaniya PKK'ê dikin. DKP'ya Şerâfettin Elçi, bi destê dewleta tîr bixwe hatîye damezirandin."



PARLEMENTER Partiya Komîrger a Gel CHP'ê Orhan Veli Yıldırım, daxuyand ku li Dêrsimê daristan bi hinceta ewlehiya rîyan ji hêla hêzên dewletê ve têne şewitandin. Li gorî Orhan Veli Yıldırım, hefteyî borî leşkeran ji bo ku darêne daristanan bilbirin, karker anîne herêmê, lê ji ber ku karkeran nexwestine vê yekê bikin, leşkeran ji bi bombeyan daristan şewitandine. Her wiha "Platforma Sendikâyên Dêrsimê" ku demek berê ji bo lêkolînêni bi vî rengi çûbûn herêmê, pişîfî vegera xwe ragihandin ku hêzên dewletê li Dêrsimê xorten kurdan hînê kişandina eroînê dikin. Cigirê Sekreterê Gişî yê CHP'ê Sinan Yerlikaya ev yek pejirand.

NÛÇE

Parêzer Levent Kanat:

Hedefa dewletê girtiyêndik in



Dewleta tîr digel ewqas reaksiyonê tûj yê navxweyî û navneteweyî disa berê xwe da girtiyêndik. Pişîku Oltan Sungurlu bû wezîrê edaletê ji bo ku li girtîgehan sîstema hucreyan bê bicikirin xebatê ji bo vê yekê lez girîtin.

Şi gorî ragihandinê dawîn vê gavê li gelek girtîgehan wekî Amasya, Ceyhan, Samsun, Maraş, Antakya, Elbistan, Uşak, Amed û Elezîz xebatê ji bo damezirandina hucreyan heye an jî, qediyaye. Ji van girtîgehan li Amasya, Samsun, Mereşê lêkirina hucreyan qediyaye. Li aliye din, li Girtîgeha Elezîz greva birçibûnê ya 40 girtiyâni ji 30 rojî derbas bû. Girtî dixwazin pest û kotekîya heyî li ser wan rabe û girtiyêndik ku ji Ceyhanê hatîbûn veguhestin bidin qawîşen siyasi.

Her wiha li Girtîgeha Aydinê jî 116 girtî digel ku nexweş in jî nayêne dermankirin. Dîsa wekî bûyereke gîfing jî hucreyan Girtîgeha Amedê ku Mazlum Doğan tê de mabû, bi sedemîn qaso hatîn hilweşandin. Li gorî nîxandinan, dewlet dixwaze bi vê yekê moralê girtiyâni xera bike. Ji ber ku ev qawîş jîxwe hucre bûne.

Her wiha li gorî daxuyaniyê parêzîren ÇHD'ê (Komeleya Hiqûqnasen Hemdem), mercen Girtîgeha Navendî ya Enqereyê wekî sala par ku 12 şorese-

ger şehîd ketibûn, bûye. Bi pey çavdêriyê parêzîren ÇHD'ê li nexweşxaneya girtî bi zincîran bi ranzayan ve têz zîncîkirin. Ji ber vê yekê ji girtî tedawiyê qebûl nakin.

Gotinê Sungurlu ne rast in

Lê digel van mînakên betbiçav û nîxandinê reşbîn Wezîrê Adaletê Oltan Sungurlu, kirinê li girtîgehan red kirin û da zanîn ku li girtîgehan "sistema jûran" heye. Li gorî daxuyaniya Sungurlu, tu caran wan li girtîgehan ji bo avakîrina hucreyan xebat nekîriye. Sungurlu idia dike ku ev nîxandin, bi zanebûn tê kirin û dûrî rastiyê ne.

Lê li ser van daxuyaniyan Parêzer Levent Kanat, ku li Girtîgeha Amasya yê lêkolîn çêkiribû, li ser pirsa me daxuyand ku wî bi çavên xwe, xebata lêkirina avahîyan dîtiye û got ku bila Oltan Sungurlu diyar bike ku ev xebat ji bo çîtê kirin. Parêzer Kanat, wekî mînak jî got ku hucreyan ji bo 60-70 kesî hatîne çêkirin.

Li aliye din heyeta ku ji bo çavdêriyê çûbû Girtîgeha Elezîz dide zanîn ku li vê girtîgehan jî karê sazikirina sîstema hucreyan tê meşandin û ew jî dibe sedema nakokî û nexweşyan di navbera girtî û rêveberen girtîgehan de. Her wiha tê diyarkirin ku wezareta Oltan Sungurlu

Parêzer Levent Kanat helwesta dewletê ya li ser girtiyâni bi politikayê wê, yê li ser Kurdistanê ve girê da û daxuyand ku dewlet bi taybefî li girtîgehan ku girtiyêndik zêdetir in, derbasî sîstema hucreyan dibe.

bi xwe ji 32 girtîgehan bi tipa E û 14 girtîgehan bi tipa taybet 216 milyar peyre terxan kiriye, da ku ew vî karî bimeşînin.

Dîsa serokê Şaxa İHD'ya Stenbolê Parêzer Ercan Kanar jî li ser heman mijarê dîtinê xwe wiha anîn zîmîn: "Wezîrê Edaletê dît ku li dijî van kîrin û xebatan reaksiyon her diçin tûjtir dîbin, gav bi paş ve avêt." Ercan Kanar û Levent Kanat, ji bo sîstema jûran jî diyar kîrin ku, ev propagandayeke derewîn e. Kanat û Kanar, wekî mînak jî rewşa girtîgehan DYD û Ewrûpayê dan û gotin ku li van welatan 24 saetan deriyê jûran vekîri ne. Hevdîtin serbest e. Jûr paqîj û tê de televîzyon heye. Girtî dikarin bi hev re bigerin û ev sîstema jiyanâ girtiyâni a taybet hêsanter dike.

Sedem kîşeyâ kurdi

Parêzer Levent Kanat, di nîxandinê xwe ya li ser sedemîn bûyeren girtîgehan de daxuyaniyê balkêş dan. Kanat bal kîşand ser politikayê dewletê, yê li ser Kurdistanê û daxuyand ku dewlet bi taybetî li girtîgehan ku girtiyêndik zêdetir in, derbasî sîstema hucreyan dike. Parêzer Kanat wiha berdewam kir: "Ji ber ku kurdênu dikevin girtîgehan jî yê derva zana û hisyartir derdikevin, zordariyê dawîn gîredayî politikaya dewletê yê ji bo kîşeyâ kurdi in. Lewra dewlet kurdênu serpeze keti û ji xwe re biyan dixwaze. Her çiqas heman tişt ji bo çepgîrên radikal ên tîr derbas dike jî, ev ji bo ku kes nabêje "dewlet bi tenê kurdan diperçiqîne" ye." Lê ji bo heman babetê Parêzer Ercan Kanar da zanîn ku her çendî ku niha bi piranî çewsandin û pêkutî li girtiyêndik, kurd tê meşandin, wê ev yek hêdi hêdi li hemmî girtîgehan belav bibe.

Fermana MGK'ê bi cih tînin

Bi van rûdanê dawîn, bi awayekî berbiçav diyar bû ku hikûmeta nû, ji bo bicîhanîna fermanê MGK'ê hatîye damezirandin. Ji ber ku MGK'ê di kombûna xwe ya di 28'ê reşemiya 1997'an de ji bo girtîgehan wiha gotibû: "Li girtîgehan sîstema hucreyan ji bo ku girtîgehan nebin hîlinâ perwerdehiyê pêwist e." Her çiqas navê Oltan Sungurlu derdikeve pêş jî, di bingeha xwe de bûyer, gîredayî helwestgirtina MGK'ê ye. Wekî ku Parêzer Levent Kanat jî got, ji bo ku dîtinê Oltan Sungurlu û yê MGK'ê li hev dikin, bicîhanîna vê yekê hêsanter dibe. Her wiha Levent Kanat, li ser vê yekê bal kîşand nedesthilatdariya hikûmetê û wekî mînak jî diyar kir ku Midûrê Giştî yê Girtîgehan Hüseyin Turgut ji wan re wiha gotiye: "Haya we ji çewsandin û zordariyê MGK'ê yê li ser me nîn e. Ji bo ku sîstema hucreyan bê damezirandin, zordayneke tûj li ser me heye." Ji bo têgihiştineke tekûttir divê mirov serhildana girtiyê adlı ya Girtîgeha Metrisê bîne bîra xwe.

Dewleteke ku li dijî girtiyê adlı wişa tevdigere, wê li dijî girtiyêndik siyasi çîbîke? Li ser bûyerâ Girtîgeha Metrisê, Serokê Baroya Stenbolê Yücel Sayman, di civîneke çapemeniyê de daxuyand ku her çiqas kiryarê bûyerê wekî girtiyêndik siyasi hatîn ragihandin, lê ev cara yeke minn e ku girtiyê adlı serî hildidin. Ev ji nişan dide ku, berpirsiyârên bûyerê, rayedarê girtîgehanê ne.

Wekî encam mirov dikare bibêje, dewleta tîr digel ewqas reaksiyonê tûj ên navxweyî û navneteweyî, bi ser girtiyêndik siyasi de diçe. Ev jî dide xuya kirin ku, dewleta tîr neçar maye û ketîye tengasiyeke mezin.

MAZLUM DOĞAN

Tu xebatên li ser zimanê kurdî ne tekûz in



DEHAM EBDULFETTAH

Di rojnameya ‘Azadiya Welat, hejmara 47’an de, mamoste-yê rîzdar, Samî Berbang gotareke ronîdar der barê pirtûka min “Hindek aloziyên zimanê kurdî” de nivîsiye. Di wê gotarê de Mamoste Samî ‘nişê’yên xwe, li ser hindek mijaren pirtûkê danîne. Bi baweriya min, gotara Samî jî dikeve warê piştgiri û hevkarîya duristkirina zimên û sazkirina raweyê wî yên rast û tekûz.

Piştî vê gotina bilez, dixwazim têbîniyê ‘mamoste Samî dubare bikim û nêrînên xwe jî, di wan de berçav bikim. Hêviya min ew e, ku mebesta me tevan hevî pêşxistina zimanê me yî neteweyî be.

Di pirtûkê de hatiye gotin: Cinavên şanîdan (nişandan) ev her du tenê ne: Ev, ew, ev her du cînav di raweyên verêse (tewangê) de dibin: evî, evê, evan, ewî, ewê, ewan.

Mamoste Samî vê gotinê napejirine û dibeye: Her weki Kamîran Bedirxan gotiye, di zaravayê kurmancî de, her weki bernavê (cînav) kesane, yên şanîdan jî du bir in, weki bira yekem “ev, ew” û bira duwemîn “vî, vê, van, wî, wê, wan” Samî pê de derê û dibeye: “Bi dîtina min jî, râvekirina Kamîran Bedirxan duristir e”

Dixwazim piştgiriya mamoste Samî bikim û bibêjim: Ne Kamîran tenê cînavên şanîdan dike dû bir, Reşîdê Kurd, Qenatê Kurdo, S. Şivan û Sadiq Behadîn jî wan cînavan dikin du bir. Lî weki me beriya nuha jî gotiye, ne her tiştê hatiye nivîsin raweya xwe ya rast û durist girtîye. Boyî ronîkirina vê mijarê pêdiviye ku em guhîn xwe bidin vê nimûneya kiriyâ:

a) Ev hesp e
ev hesp in
ew hesp e
ew hesp in

ev mihîn e
ev mihîn in
ew mihîn e
ew mihîn in

b) Ez evî (ev+î) hespî (hesp+î) dixwazim

Ez evan (ev+an) hespan (hesp+an)

Çendî mirov zimanzan be, çendî zîrek û zanyar be jî bi tena xwe naşê (nikare) hemû mijar û babetên zimên bi şêweyekî sergihayî tekûz bike. Zimanê kurdî jî ber gelek merc û bendên dîrokî bi hêsanî saz nabe. Gelek kar û xebat jî me tê xwestin. Ci tiştê ku heta niha hatiye danîn dergehêne tevdan û vekolînê li pey xwe vekirî hiştine.

dixwazim

Ez evê (ev+î) mihînê (mihîn+î) dixwazim

Ez evan (ev+an) mihînan (mihîn+an) dixwazim

Ez ewî (ew+î) hespî (hesp+î) dixwazim

Ez ewan (ew+an) hespan (hesp+an) dixwazim

Ez ewê (ew+î) mihînê (mihîn+î) dixwazim

Ez ewan (ew+an) mihînan (mihîn+an) dixwazim

Vêca pîrsa me ev e: Gelo ev her du nav (hesp, mihîn) ên ku di mînakên (b) yê de, ew (hesp, mihîn) ên ku di mînakên (a)yê de, bi xwe ne, yan na?! Ma ji bili wan nişandekên tewangê: -î, -ê, -an, -en ku gihiştine “hesp, mihîn” ên di mînakên (b) yê de, ci têveli di ñavbera navê her du mînakân de hêye?!

Gelo navê “Zîn” di vê hevokê de: (Zîn nameyê dixwîne), ne ev navê “Zîn” yê ku di vê hevokê de ye: Zînê name xwend?!

Heger bersiva van pîrsiyaran “erê” be, dê li gora rîpîvanê, cînavên şanîdan jî di mînakên (b) yê de herî ew cînavên şanîdan yê ku di mînakên (a)yê de bin, tenê nişandekên verêse (i, ê, an) di mînakên (b)yê de gihiştine van cînavê şanîdan, ên xwerû di mînakên (a) de.

Nîvîsandina pînasa kesan:

Mamoste Samî li ser gotina “Ji apê Reşîd re” radiweste û dibeye, ev gotin bi wateya “ji apê min Reşîd re” ye. Ez bi xwe jî vê wateyê di gotinê de dibûnim. Lî gelek caran avêtina ‘min’ê tevlîhevîyeke wateyi berçav dike.

Nimûne: Reşîd û apê xwe digel hev dijîn. Du name ji wan re hatîn. Li ser pişta yekê: “ji apê Reşîd re” hatîbû nîvîsin. Û li ser ya dî: “ji Reşîd re” hatîbû nîvîsin. Vêca, ji her du nameyan, kîjan ya Reşîd e?!

Di vê mînakê de, tu caran ne durist e ku Reşîd nameya apê xwe, bîke ya xwe.

Mamoste Samî li ser raweya “apo Reşîd” ya ku di pirtûkê de hatiye jî radiweste û dibeye, parkîtên ‘o, ê’ bo baneşanê ne û ne durist e ku em ji bili raweya baneşanê, bibêjin: (apo Reşîd, metê Rewşen)

Em dizanîn ku ‘o, ê’ paşkokên baneşanê ne. Ango bi navê bankirî ve têne nivîsin. Lî demâ navek bi piranî, bi raweya baneşanê bikar tê: Lo Hemo, lo Memo, Lî Fatê.., ev nav digel paşkoka xwe ya baneşanê, dibin mîna navekî resen. Hingê, nav û paşkok bi hev re, we-

kî navekî serbixwe, di raweyên dîtir de jî bi kar tê.

– Hemo çû Memo hat.

– Fatê keça Reşido ye

Ji hêleke dî jî, ev paşkokên baneşanê digihêjin hindek navan. Hingê, ji paşkokîya baneşanîyê dûr dikevin û dibin weki alaveke (emrazeke) pînasiyê.

Nimûne:

Li Sûriyeyê, navê Osman Sebî bêyi pînasa “Apo” nayê hildan.

– Apo Osman Sebî têkoşerekî nîvîser bû.

– Zimanê Apo Osman zelal û rewan bû.

Her wisan ji pînasa rîzdar Abdullah Ocalan:

– Serok Apo Serkês û rîberê gel e.

Berçav e ku di van mînakân de, “O” gihiştîye navan, bêyi ku ew nav di raweyâ baneşanê de bin. Ji hêleke dî jî, peyva ‘ap’ navekî pendî (naskirî) ye. Nependîya wî “apek”â. Dema ku “O” digihêje “ap”, pirtir tê naskirin. Anglo, di pileya (dereca) nasînê de dibe weki navekî bernas (sernav), ji ber vê egerê jî, seretişa navê ‘apo’, girdek (gîrnîvîs) tê danîn.

Di rûpel 11’an de, ji pirtûka çêlkirî, min hevberiyek di navbera “dî” û “din”ê de çekîriye. Paşê ez gihiştîme encamekê ku “dî” dikeve ber rîpîvanê zimên, lê “Din”-bi rîbîhistinê bi kar tê.

Mamoste Samî Berbang dibeye, dibe ku ku “dî” ji “du” hatîbe, û “din” jî, ji “dîtîrîn” hatîbe, weki ku Celadet Bedirxan gotiye, “hev” ji “yew” a kirdî hatîye. Di encam de, Samî dibeye, her du bêje ji “dî” û “din” cihê hev digirin û bikeranîna wan aloziyê peyda nake.

Ez bi xwe nizanim, ka “dî, din” ji ku hatîne û ez gotina Samî jî neyîn nakim (red nakim). Tenê ez dixwazim bibêjim, “dî” û “din” her du jî rewş in. “Dî” li gora rîpîvana rîzimanê bi kar tê, lê “din” bi rîbîhistinê bikar tê, reng e ji ku “din” bi şêweyekî ji şêweyan, li gorî rîpîvanê bi kar tê.

Ji vê sedemê min gotiye, “dî” ji “din”ê duristir e, lê min negotiye bikarîna “din”ê şâsi ye.

Di rûpel 11’an de ji pirtûkê, min çend nimûneyen zayandan berçav kirine. Ew nimûne li hindek herêman, bi rîbîhistinê, nêrza tên lêvkirin. Peyva “kengî” jî, yek ji wan nimûneyan e.

Mamoste Samî li ser “kengî” radiweste, û dibeye, “kengî” hokereke pîrsiyarî ye, ne guhîrbar e, gerek bê zayende be (weki ku ez tê gihiştîme)

Mebesta min ji zayenda “kengî/e” ew e, ku ev hokeran pîrsiyarî ya ku bi demê

ve girêdayî ye, bi nêrziyî li herêman tê lêvkirin:

– Tu kengî çûyî gund (ci çaxî)?

Ü bi mîzayî li herêmane dîtir tê lêvkirin:

– Tu kengê, çûyî gund (ci çaxê).

Melayê Cizîri di serê dîwana xwe de dibêje:

“Newaya mutrib û çengê fixan avête xerçengê Were-saqî- heta kengê neşoyin dil ji vê zengê?

Di rûpela (10)an de ji pirtûkê, min gotiye, “wê” ne ji alavê dema paşerojê (bê) ye. Ew ji (ew + ê) pêk hatîye.

Mamoste Samî der barê vê bêjeyê de bala min kişandiye ser mijareke hûr. Samî dibeye, alavê dema bê “ê, dê”, ji jêderâ “hatîn”ê ne.

Ev têbiniya Samî hûrbîn û balkê e. Lê mixabin, mamoste bi mînakân hînker, nêrîna xwe ronî nekiriye. Gotin tenê jî, ne besî dîtineke wisan girîng e. Bi desâtura mamoste Samî be, ez ê, li gora zanîna xwe, bi mînakân, vê mijarê tev bidim:

Heger “ê, dê” ji “hatîn”ê bin, gerek, ew bi vê rîbâzê saz bûbin:

a) Mem “ê, dê” biçe=Mem “hê, dihê” biçe.

(her weki em dizanîn, ‘h’ bi egara si-vikbûnê tê avêtin “hew=ew, heger=ger.”)

Mem “..ê, di.. ê” biçe.

(di ‘di.. ê’, de du dengdêr gihiştîn hev. Pêdîvî ye ku ‘ye’ bikeve navbera wan “diyê”yê, yan jî, dengdêra pêşî “î” bê avêtin, “di.. ê”)

Mem “ê, di.. ê=dê” biçe.

Nexwe, “ê, dê” ji “hatîn ”ê ne!

Lê mixabin- ev rîbaza ku em gihan-dine vê encamê, bi kesen yekem û du-wem, û bi kesen gelejimar re saz û durist nabe. Tenê bi kesê sêyem ê yekjimar re saz dibe.

Nimûneyine Kirbyarî:

Bi kesê sêyem ê yekjimar re:

– Ew “ê, dê” biçe. (weki ku em bibêjîn: Ew “dike” biçe), li gorî Samî gotiye (weki ku me di benda ‘a’yê de rave kiriye.)

b) Bi kesê yekem û yekjimar re:

(ez “kim, dikim” biçim)

– EZ “hêtim, dihêtim” biçim.

(Bi rîpîvana benda ‘a’yê, dibe: Ez “êm, dêm” biçim.

c) Bi kesê duwem û yekjimar re:

– Tu “eyî, dêyî” biçi.

ç) bi kesen geljimar re:

– Em “ên, dên” biçin

– Hun “ên, dên” biçin

Ew “ên, dên” biçin.

Berçav e ku ev “ê, dê” yên ku di raweysa dema paşerojê (bê) de tê, ne ew “ê, dê” yên ku bi kesê sêyemîn re, di dema nuha de ne. Bi gotineke vekiristir, ev “ê, dê” yên dema paşerojê alav in (xurdebeh in), ne lêker in. Lê yên ji “hatin”ê, lêker in. Çunkî lêkera “hatin”ê bi cînaven kesane yê salt re (ez, tu..), paşkokên kesanî (im, i, e, in) divêt: “ez êm, dêm”.

– Niha em ê vegevin mijara xwe ya serekî, “wê” ya ku mamoste Samî der barê wê de dibêje, “wê” ji “w” ya pêwend û “ê” ya dema bê, pêk hatiye.

Ez bi xwe, ne bi dîtina Samî re me. Çunkî, heger ev “w”, di navbera du den-gêran tenê de bihata, me karibû em li ser wê dîtinê rawestin.

Weki “Memo w-ê (wê) biçe gund.”, “Leyla wê biçe gund.” Lê ev ‘w’ ya ‘wê’ yê ne di navbera du dengdêran de ye, weki “Mamed wê biçe gund.”, “Zin wê biçe gund.”

Ne wilo tenê ji ev “wê” gelek caran li pêş navdêrê xwe ji bi kar tê.

– weki: “Wê Şîrîn biçe gund.”, “Wê iroj Mem biçe gund.”

Vêca, heger ev ‘w’ di navbera du den-gan de (pêwend) be. Ango tipa navbira dengan be; yan ji, ya kelijandinê be, li gorî navlêkirina Feqe Huseyn; ka ew ê di mînakê bêyî du tûpêñ dengêr, ci be?!

Di baweriya min de, ev “wê”, ya ku mijara me ye, ne ji “w” ya navbir (pêwend) û “ê” ya dema paşerojê (bê) pêk hatiye. Li gora şirovekirina me ya jorîn, û weki ku me di pirtûkê de ji gotiye, ev “wê” ji “ew-ê” pêk hatiye. Ango, ji cînavê kesane “ew” û alava paşerojê “ê” saz bûye.

Der barê vê hevokê: “Min hespin cenc dîtin”, mamoste Samî dibêje: Tipa ‘i’ yê li wê derê ji bo tewangê ye û bi te-

nê pişti navdêrê nêr ên nebinavkirî tê xebitandin, yanî mirov kare ‘hespekî qenc’ bibêje. Lê di kurmancî de gelej-mar vejetandekêny zayendê nagirin. Li gorî C. Bedirxan awayê rast “hespine qenc” e)

Bila mamoste Samî li min negir e ku ez jê re bibêjim: Tu şaş çûyi mijarê! Her weki ku me di pirtûkê, rûpela (113) an de ji gotiye, ev ‘i’ ya ku di vê hevokê de hatiye “hespinî qenc hatin”, ne ‘i’ ya te-wangê ye. Nîşandekêny tewangê nagihêjin navdêrê rewşadar. Tenê, ew dighêjin navdêrê rût i bêrewş.

Weki: ‘ê’ – pelên darê kesk in
‘i’ – rengê vî hespi boz e
‘an’ – rûmeta keçan weki ya lawan bigirin.

Lê ‘i’ ya ku te di vê mînaka xwe de aniyê: ‘hespekî qenc’, ne ‘i’ ya tewangê ye. Weki ku tu dibêji. Ev ‘i’ ya pêgirêdanê ye (girêdana rewş û navdêr pêk tîne) tipen pêgirêdanê ji ev in: “e, i”

Nîmûne:
– “e” – Keçeye qenc hat
– Keçine qenc hatin
“i” – kurekî qenc hat
– kurînî qenc hatin.

Li gorî Celadet Bedirxan, em ê bibêjin “kurine” ji dêvla “kurînî”. Min dîtina xwe der barê ‘i’ ya “kurînî qenc” li ser van her du xalan ava kiriye:

1- Di nav gel de, bi firehî, ev rawe tê bikaranîn, û li gelek herêman (li ser asta nivîsin û devokî) ji, tê bikaranîn.

2- Rêpîvaneke rézimanî ye, li gora mîjîr û zayendeyen mîzayen yekjimar û gelejimar ên ku bi ‘e’ yê tene girêdan. Li ber ronahiya van her du bingehê (nemaze xebitandina gel), min ew rîzan daniye, ne ji ber xwe ve.

Li ser zêderâ (vejetandeka) dûbareki-

rinî û sêbarekirin ji, mamoste Samî radiweste, û bi kurtebirî dibêje, gerek her du zêder, di vê hevokê de “bizina min i kol i kej hat”, li hev binêrin û li gorî hev bê, ango, gerek wisan, hevok bihata: “bizina min a kol..”

Ji hêleke dî ji, mamoste tê gihiştiye ku ez di pirtûkê de dibêjim, “i” dide nasin ku “bizina kol” yek tenê ye.

1- Ev babet hindekî hûr û fireh e. Ez nikarim di vê gotarê de, careke dî “zeviya xwe dugisın bikim”. Tenê li van rûpe-lén pirtûkê vegere: 131-136

2- C. Bedirxan, K. Bedirxan, R. Kurd, R. Lësko.. Ev rawe bi kar anîne, kirine, bêyî ku yek ji wan ji, rîzana (qeyda) wê ronî bike..

3- Ev rawe, di nav gel de bi firehî tê xebitandin.

Ez li ser gotinê rézimanî rawestiyam, û min dîtinê wan hevberî xebitandina gel kir. Di encam de, ez gihiştime wan baweriyen ku min ew di pirtûka xwe de berçav kirine.

Mamoste Samî Berbang “nişê” ya xwe ya dawî derbarê neyînkirina raweya fermanî de berçav dike.

Di pirtûkê de, rûpel (105), min gotiye, li hindek navçeyen welêt “meke”, ji dév-la “neke” bi kar tê, û di vê raweyê de ti-pa ‘n’ bûye ‘m’. Ango, bi egara nêzikbu-na cîderen her du tipan ji hev, bi hev hâtine guhertin.

Bo çespanâna (teyîdkirin) vê dîtinê ji:

1- Hemû alavên neyînî, bi ‘n’ yê dest pê dibin: (nekir, nake, nikare, nîn e, niye, na, no) û ‘neke’

Di raweya fermanî tenê de “meke”, di súma “neke” de hatiye bikananîn.

2- Navê raweya “neyînî, neyînkirin”, ji sereti-pa ‘n’ yê hatiye. Û tu kesî negoti-

ye, û nebihiştiye “meyînî, meyînkirin”

3- Dema ku em dibêjin, “neke”, jê dera vê raweyê, “nekirin” e. Tê gotin: “kirin û nekirin, ne wekî hev in”

Lê jêderka “meke”, “mekirin” e. Gelô em karin bibêjin: “kirin û mekirin, ne wekî hev in?”

Ji ber ku ev “me”, li hindek herêman û di raweya fermanî tenê de bikar tê; em dibînin ku ev bikaranîna wî şeweyî awarte ye, ne rîpîvaneke rézimanî ye. Ji ber vê sedemê tenê ji me xwest em binasin ka ev “mê” ji ku hatiye û çîma bi raweya fermanî tenê de tê xebitandin.

Baweriya me, di warê “me” yê de ew e, ku hevgüherîneke devokî, li dirêjayıya dirokê, di navbera ‘n’ yê û ‘m’ yê de çebûye.

Mamoste Samî, vê dîtinê naejirîne û di nav gotinê xwe de dibêje: “Bes tê za-nîn ku dîroka devokan ne ew qas kûr û dûr e..” Rastî ev gotina Samî, gelekî seyr û balkêş e.

Ma pirsgirêka herfi aloz, ku di dilen lê-kolînvanen kurdan de şax vedaye, ji bili vê dîroka (kûr û dûr) i xilekwindayî ci heye?!

Ma kî ji me zane, kengî û çawan ev peyv ji kokên xwe, bi devokî sivik bûne: “Çündin=çûn, mandin=man, gazind=gazin, xwerdin=xwarin, hindek=hinek..?”

yan ji, di ci qonaxê de ev tip, bi hev hâtine guherin: bîhîstîn=bîhîztin, kuj-tin=küstün, birçî=bîrsi...?

Kî dizane, dîroka cîguherîna van tipan kengî dest pê bûye: berf=befr, alî=layî..?

Gelo rast “dîroka devokan ne ew qas kûr û dûr e”?

Li dûmahiya vê gotarê, ez spasiya birayê hêja Samî Berbang dikim. Hêviyâ min ew e ku em ji hev re bibin alîkar û

Şewat

OSMAN ÖZÇELİK



Di zimanê me de ‘nîfir’ û ‘dijûn’ (xeber, gotinêne nebaş xwedîyê cihekî taybet in. Ez bawer nakim ku di tu zimanî de nîfir û dijûnên wisa ecêb, wilo xeyalfireh û wiha ku dilê mirov biguvişin, hebin.

Ma gelo temâşevanen kîjan mileti dizanî ji hekemê maça futbolê re bibêjin “Hekem, hekem min di noka pîpîk (tûtîk) te ga...”

Kurd nefreta xwe ji, hezkirina xwe ji bi dilînen (hest) bilind, bi awayekî herf tûj tînîn zîmîn. Ku kurd ji yekî hez bikin yek derb hema dibêjin “ez bi qurbana serê te bîm!..” an ji “xwîna min li eniya te bikeve”

Nîfirîn me ji ewha tûj in. Bila em ji yekî neqehîrin. Em pê ve datînin: “Bîlqîtiyo!” Nîfirîn kurdan yê herf gîran li ser “agir” û şewatê” ne. Kurd ji égir û şewatê gelekî ditîrsin. Û nemaze ji şewata malê..

“Şewata malê” kurdan diquifîne. Ji ber vêya ew naxwazin nîfîra şewatê li wan bê. Ger ew bixwazin nîfîra girantîrin bikin dibêjin “mala te bişewite!” Nîfirîn agir û

şewatê cur be cur in.

Di mîtolojiya yewnanan de agir cihekî giřing digire. Bîkaranîna êgir di destê xwe-dayan de ye. Tenê xweda dikarin agir bi kar bînîn. Agir bi dest gel nakeve. Prometheus radibe agir didize; direvîne tîne dide gel.

Xweda Prometheus tawânbar dike û li çiayê Qaf li ser tehtekî mezîn Prometheus bi bizmar û zincîran girê dide. Û qertol tê, kezeb dîsa mezîn dibe û dîsa qertol tê kezeba wî dinikulîne.

Edî-em nîzânîn Prometheus agir gihand ser desten kurdan ji an na û em nîzânîn bê ka pêşiyen me çawa bi bûne agirperest. Bi qasî ku em dizanî ola kurdan ya kevnîr “agir-perestî” bûye û hêj bandora agirperestiyê di nav jiyanâ me ya cîvâkî de dixuye. Şopên agirperestiyê kûr mane.

Bi ya min agirperestiyâ kurdan, ne agir-parêzî ye “agirtîsî” ye. Ku ne agirtîr bûya ewqas nîfirîn gîran yêni bi agir û şewat dihat afîrandin?

Dijminen kurdan ev qelsbûna wan nas kirine. Dizanîn ku kurd bi lêdanê serê xwe natewînîn, bi kuştînê ji kurd naqedin. Radibin mala wan, gundê wan dişewittînîn. Dişewittînîn ku agir berdin kezeba wan.

Ev serê 13 salan e ku ar bi mala me, bi gundê me dixin. Dilê wan hênik nabe, edî agir bi çiya, dar û daristanen me dixin. Di

van rojan de qırçeqirça şewata çiayêni Dêrsimê di ezmanê heftan de derdikeye pişti tevkuiya mirovan, tevkuiya heywanan ji pêk finin. Rovî, kêrgo û hirçen me şewitandin. Mêş û mozên çiayêni me, pinpinikên me yêng reng reng hemû qelihandin.

Yêna mala wan neşewîsi be, yê agir bi gundê wan neketbin, yê di şer de, dê û bayê xwe; xwişk û birayê xwe winda nekîribin û tirsehêza şer nas nekîrin doza me ya “aştiyê” fêm nakin.

Mirov li Şîrnexê, li Cizîrê, li Culêmêrgê nejiyi be, ma wê çawa bi ferqa jiyanâ Kadikoyê, Bostancî, Yeşilyurt û Modayê û ya wan deran bizanibe? Dûxana eşq û alkola barên Beyoğlu li ser serê mirov digere ne mîna mij û dûmana bombeyan e ku li ser serê Cûdî digere. Yêna bi van nîzânîn doza me ya aştiyê biçûk dibînîn, rexne dikin. Dibêjin hûn reformist in (Xwezi me karibuya reformê çêkin)

De werin ji xwe re li vê ecêbê binêrin, “şoreşgerên” kantînen universiteyan û yê “bar” en Stenbolê doza gelê kurd a aştiyê naçibîn. Dibêjin ma ci ye hema hûn dibêjin “aşti û aşti” û didomîn “aşti be aşti, şer be şer!”

De kavem ji wan re ci bibêjin “agir bi mala wan bikeve.”

Ez li benda Mirovê Mezin û gerîla me

Hûn dikarin xwe, bi me bidin nasîn?

- Navê min Mezopotamya ye. Ez bê xwedibûm. Ne dê, ne jî bavê min hebûn dema ku min xwe li ser erdê dît. Ji aliye cih ve jî, ez di dilê Rojhilata Navîn de rûdinim.

Ne dê, ne jî bavê we hebû, ev çawa dibe? Hûn dikarin ji me re hinekî vê mijarê vekin?

- Belê, bi rastî jî nizanim ew roj ci roj bû. Bi singûyan li min didan û digotin: "Bes e êdi rabe ji xewê." Ez ji xewê hisyar bûm. Min dît ku deriyê malê heta ser pişte vekiriye. Bang dikim dayê, dayê tune ye. Bang dikim bavo. Bavo tune ye. Li malê dawet li dar diket. "Ev ci ye?" Ez mam heyrî. Min carinan bi keser, carinan jî bi gîrî derbas dikir. Ez ji cihê xwe rabûm û ber bi derî ve çûm. Wê demê, hîn bêhtir ez mam heyrî, li xwe û li rewşa derive. Herkesi cilên nû li xwe kiribûn. Pir kîfxweş bûn. Li mîlekî dahol lêdiket, li ber daholê jî dîlan digeriya. Govend fireh bû. Di nava wê de tenê zava xuya bû, bûk tunebû. Ez rûniştîm û bi ser xwe de fikirîm.

Wekî ku tê fêmkirin, hûn bêçare mane. Gelo we bi ci rengi çareser kir?

- Çavelî min razayî, yê din jî hisyar bû. Ji nişka ve dengê "Rojbaş yadê" ket guhê min. Hema ez rabûm ser piya û hêstirê xwe min paqîj kirin. Min got: "Tu kî yi? Got: "Xema neke dayê. Ez Mizgîn im. Hatime hin tiştan ji te re bibêjim. Ev daweta li dar dikeve tev ji bo te ye. Li ser xweşikbûna te gelek mirov hatin kuştin. Ji bo ku li ser dewlemendiya te bijîn. Bawer neke ji wan. Ew gurê boz in. Lé ji bîr neke ku ev rûyekî dîrokê ye. Ez jî rûyê dîrokê yê duyemin im." Dema wisa got, min pîrsî: "Rûyê dîrokê yê duyemin çawa dibe?" Mizgînê wiha bersiv da: "Lez mekê dayika min, xema jî neke. Ew roj were tu yê bi xwe bibînî" got û ji pêş çavên min wîda bû.

Hêviyeke çawa bi we re hişt!

- Hêviye xelasîyê û rojek azad bi min re hişt. Ez azad dikirim. Axînê min ez re biçük dixistim. Min ji xwe re digot, gelo kengê çavê min wê li rûyê dîroka Mizgînîyê bikeve û emê destê hev bigirin? Tebata min nedihat. Bêaramîyê ez di nava xwe de winda dikirim. Min dixwest roj wekî dizîn şevê biçin û bêñ. Lé mixabin te digot qey roj wisa li pişta xwe kirine, ew qasî hêdi hêdi dîmesîyan.

Xuyaye ku bêaramiya we hûn dixistin rewseke dijwar. Çend sala wiha dom kir û di kijan salê de dîroka duyemîn silav da we û bi ci rengi çebû?

- Ji berî Isa bi hezar salî dest pê kir. 388 salan bêaramiya min dom kir. Di destpêka 612'an de beriya Isa careke din dengê "Rojbaş yadê" hat guhê min. Ji esq û evîna re hêstirê şadiye ji çavên min dilop dilop hatin xwarê û bi dengekî bilind

Di destpêkê de jî min da xuyakirin ku Benda Karkeran bihar e. Ji bo vê yekê, yê ku biharê xweşik dike û bi kesk sor û zer dixemilîne jî gel e. Ji ber ku gel, bax û bostan e. Dema ku mirov dikeve nava baxekî jî, kîjan gula xweşik hebe wê gulê bêhn dike û av dide. Gerîla jî ev gula xweşik e. Yanê ku'lîka biharê ye. Gerîla ji bo gel Mizgîn e.

min jî bi "Rojbaş" ê bersiv dayê. Wê jî bi rûyekî bi ken, "Min ne got xema neke yadê. Rojek were rûyê dîroka duyemin wê silav bide te?"

Sozê Mizgînê, dilê min wekî gûleke avdayî vekir û dilê min ges kir. Bi axaftina Mizgînê re ez ketim nav xeyalê azadiyê. Dilînê (hest) min pir bilind bûn. Demeke dirêj derbas bûbû lê, ez bi xwe nehesiyabûm. Ji ber ku Mizgînê, ez bi xwe re revandibûm. Ji nişka ve 'Yadê, yadê ma te ez ji bîr kirim? Ez jî dizanim Mizgîn dilê mirovan rehet dike û bi xwe re direvîne. Lé tu guhê xwe bide rê, dengê lingê dîrokê tê. Ewê te bêhtir kîfxweş bike" ji min re hat gotin.

Bi lez hema ez beziyam pêsiya derî û min li rûyê dîrokê mîze kir. Ez ci bibînim? Di her pelek wê de kînek hebû, di her çavekî wê de tolhîdanek hebû, li ser sîngâ wê 612 sal berî Isa nîvîsandibûn. Û bi wê meşa xwe re gîhît nava dawetê. Dest bi cengê kir. Pir li ber xwe dâ. Xwîn weke rûbaran herikî. Mirov dihatin kuştin. Li hemberî kuştina wan, min nikaribû xwe bigirta. Ji ber ku, ew car, cara yekemîn bû min kuştin bi vî hawî didit.

Careke din min jê pîrsîya: "Tu kî ye?" Bersiv da û got: "Ez beşek ji te me. Ez dîrok im dayê." Ez baş dizanim tu dîrok i. Lé tu ji ku derketî, ez wê nizanim. Dîrokê serê xwe hejand û gote min: "Biqulubîne rûpelê min, tuyê bizanibî ez ji ku hatime." Min rûpelê wê quliband. Rûpel biçûk bûn, lê naveroka wê pir tîjî bû.

Di çavê her nîvîseke wê de girî, nalîn û kuştinek hebû. Min xwe negirt, ez jî di ber re digiriym. Wê demê dîrokê ji min re got: "Qet xwe newestîne dayika min. Ew peyv navê te ye." Min jê pîrsî: "Navê min ci ye?"

Mizgînî bi rûyekî bi ken ji min re got: "Mezopotamya ye dayika min." Wê demê ez hîn bûm ku navê min Mezopotamya ye. Min keserek kişand.

Serkeftina wê di kijan demê de û çawa pêk hat?

• Dema kú nîvîsen xwînî di rîzîn rûpelê dîrokê de radizan, wê demê di lezbûna wê de xuya bû ku ber bi serkeftinê ve diçê. Yanê pişti berxwedaneke mezin, rijandina xwînî û şehîdbûna gelek lehengan, împaratora Med hate avakirin.

Di vê demê de, wê jiyanek çawa derbas kir û paşê çawa bû?

Kurm diketinê. Wê demê kesen wek Bekoyê Ewan dibûn gur û evîna kurdî dixwarin. Nêrîna min ya nebaş li ser rûpelê beriya Benda Karkeran ev e.

Ez vê bendê wekî biharê şirove dikim. Ew bi helandina berfê û herikanda çeman, bi qebeqeba kewan û bêhna gul û sosinan li meydana xweşikbûnê dixwîne. Yanê ger mirov bibêje ew bijîsk e jî, ez bawer im tu quşûr wê tunebe. İro, Benda Karkeran xwe bi gerîla xemîlandiye. Gerîla jî, biharê xweşik dike. Her gerîlayek semboleke, dema ez li vir romana jiyanâ wan dixwînim bêhna min bi wan vedibe. İro navê serfiraziyê ew e ku bi xwînê hatiye nîvîsandin û li ser asîmanê min cih girtiye. Wekî tîrîjîn rojê berfa li ser sînga min dihelîne û "Rojbaş hevalno, va ye ez im Mizgîna azadiyê" dibêje.

We got ku Benda Karkeran bijîsk e, dermanekî çawa ji bo birîna we peyda dike?

- Ji bo jiyanek azad şerîntir tu tiştune ye. Ji bo ku birînek derman bibe, lehengiyeke mezin pîwest e. Dil û cegerek ji pola dixwaze. İro dermanê ku ew ji bo birîna min jî peyda kiriye, xwîna şehîdan e. Birîna ku bi xwînê bê dermankirin jî, ne gengaz e ku careke din jan bide, an jî lêmî bigire. Lewre her birînek vebûye, di şûnê de ev bend gulekê şîn dike.

Gel, gerîla û şehîd ji bona we ci ifade dike?

- Di destpêkê de jî min da xuyakirin ku Benda Karkeran bihar e. Ji bo vê yekê, yê ku biharê xweşik dike û bi kesk sor û zer dixemilîne jî gel e. Ji ber ku gel, bax û bostan e. Dema ku mirov dikeve nava baxekî jî, kîjan gula xweşik hebe wê gulê bêhn dike û av dide. Gerîla jî ev gula xweşik e. Yanê ku'lîka biharê ye. Gerîla ji bo gel Mizgîn e. Bi kinahî ez aña wan jm. Ava jiyanâ me teva jî xwîna şehîdan e. Her mirov xwedî dil e, dema ku dil bisekine dimire. Benda Karkeran jî ji bo min dil e, bê wê ez nikarim bijîm.

Wê demê dilê Benda Karkeran kî ye?

- Bêguman dilê wê serok e.

Tu dilê kî ye?

- Ez dilê Rojhilata Navîn im.

Di dawiyê de hûn tu tiştî dibêjin?

- Bi van dilînê xwe yê bilind, bi moralâ ku min ji Benda Karkeran girtiye, ez wekî dayikekê, ji hinava dilê xwe silav û hurmeten xwe ji her sê çekên polayî re; parfü, enî û artêşê re dişinim. Careke din bi hürmeteke mezin, ez li hemberî mirov mezin û şehîdîn serxwebûn û azadiyê serê xwe ditewînim. Silav dikim û serkeftinê di xebata welatparêzan de dixwazim.

MUHAMMED MIHO



- 04.08.1914: Şerê cihanê yê yekemîn dest pê kir.
- 04.08.1960: Mamoste Refîq Hîlîmî çû ser heqîya xwe.
- 05.08.1895

Frederich Engels çû ser dilovaniya xwe.

- 06.08.1945

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di şerê cihanê yê duymîn de, li hember Japoniyâ cara yekemîn bombeya atomê bi kar anî. Weki tê zanîn wê rojê bajarê Hiroşimayê bi bombeya atomê ku Albert Einstein icad kiribû , ser û bino bû. Pişf sê rojan jî bajarê Nagazakiyê bû hedefa bombeya atomê

- 08.08.1993: Nûçevanê rojnameya Özgür Gündemê Ferhat Tepe ji, aliye kontrayan ve hate qetilkirin.

- 08.08.1998

Haci Selim Ekmen li Batmanê hate kuştin.

- 09.08.1992

Nûçevan û nivîskarê rojnameya özgür Gündemê Hüseyin Deniz li Ceylanpinara Ruhayê ji hêla kontrayan ve hate qetilkirin.

- 09.08.1987

Endamê Komîteya Navendî ya PKK'ê Haydar Karasungur (Hüseyîn) di nav şer de kete nav refîn pakrewanan.

AWIR

Rojnameyan û rewşenbîrê kurdistani: HÜSEYİN DENİZ



Roja 8'ê gelawaja 1992'yan di quncika xwe ya bi navê "Forum" ya di rojnameya Özgür Gündem de wiha gotibû: "Di dema vê koalisyonâ DYP-SHP'ê de, ku bi gelek heytehol û fortan ava bû, hejmara rojnameyanê kuştî, tevî rojnameyanê Özgür Gündem yê Kercewsê Yahya Orhan bûn heft..."

Belê, xwediyê van gotinên jorê Hüseyîn Deniz, pişti rojekê angô roja 9'ê gelawaja 92'yan dîsa ji hêla wan 'kesen tarî' ve li navenda Serêkaniya (Ceylanpinar) Ruhayê hate qetilkirin. Dilsozê Kurdistanê û xwarziyê Apê Musa, Hüseyîn Deniz, beriya jiyanâ rojnamegeriyê, mamoste bû. Lî ji ber ku tu car zarokên xwe fêri "Türküm, doğrûyım, çalışkanım" û "Bir türk dünyaya bedeldir" nekiribûn, ji ber ku her dem başî rastî û delaliya mirovahiyê dixiste mejiyê zarokan, gelek asteng derxistin pêsiya wî. Lewre jî ev asteng û rîlibergirtin, hatibû, asteke wiha ku "Bi tawanbariya siyasî" ew ji kar jî avêtin. Gelek salan li Girtigeha Amedê ma û li wîr por spî kir. Pişti derketina ji girtigehê, ji salên 1984'an û sün ve bi rîzê, derd û kesera gelê bê dewlet, di ajans û rojnameyên wekî UBA, Cumhuriyet, 2000'e Doğru, Sokak, Ekspres, Yeni Ülke, Özgür Gündem û Welat de nivîsand. Bêgunan, nivîskarı û rojnamegeriya di rojnameyên Yeni Ülke Özgür Gündem û Welat de bandoreke giran li ser xwânmijê Kurdistanê dihişt. Lewre jî berdêla nivîsen di wan rojnameyan de "mirin" bi xwe bû. Hüseyîn Deniz, pişti ku dikeve nav refîn rojnamegeriya kurdî, beramberî wê di be hedefê êrisan jî. Beriya ku bê qetilkirin bi du rojan, ji derdor û malbatâ xwe re wiha gotibû: "Ew keşen ku min teqîb dikin, endamê kontrgerila ne, navê wan jî, Mehmet Kaya û Mehmet Güle. Heger ez bêmê kuştin, ji destê wan kesan e." Hüseyîn Deniz roja 9'ê gelawejê serê sibê dema ku diçe ser kare xwe, li ser sûka Gaziya Ceylanpinarê ji hêla sê kesan ve tê gulebarankirin. Bi awayekî birinxedar, dema wî rádiyî, Nexweşxaneya Zanîngîha Dicleye, li Amedê 28 saet derbas bûne û bêyi mudaxeleyeke qenc, li derdora nivîro, dikeve nav refîn sehidîn şoreşa Kurdistanê.

Kujerên Mamoste Hüseyîn, ji hêla şahidîn xwechiî ve hatin tesbîtkirin. Hate ragihandin ku, Nihat Beşkat û İbrahim Halil Göv ev êris pêk anîne. Pişti ku hat ragihandin ku ev kes, ji hêla rayedarêne dewletê ve tene veşartin û parastin û ev agahî jî di rojnameyên kurdan de hate weşandin, Nihat Beşkat hate girtin, lê pişti demeke kurt jî hate berdan.


Pişti ku Hüseyîn Deniz şehîd ket, gelek tişt li ser wî hatin gotin. Wê rojê bêdena wî ya pîroz bi rengê herî xwes; kesk û sör û zer hate pêçan. Dema çû, ji şagirtên xwê re, bîr û baweriya xwe, pirtükên "Hayvanlar arasında (Di nav sewalan de) û "Gotinê Pêşiyen Kurdan" hiştin.

Hüseyîn Deniz her çiqas di rojnameyên "Özgür Gündem, Yeni Ülke" û hwd. de bi tirkî dinîvisand jî, ji bo wî nivîsandina bi kurdî gelek pêwist bû. Nêzîki 30 nivîsen wî bi navê "Hüseyîn Deniz û Dicle Fîrat" di rojnameya Welat de bi kurdî derketin. Nivîsen mamosteyê hêja bi piranî li ser çand, ziman, folklor, mizah û li ser perwerdehiya zarokan bûn.

Pişti sehadeta wî, xalê wî û apê me Musa Anter wiha gotibû: "Xwarziyê delal, ezê ji iro û pê de, dêvla te jî binîvisim." Em jî jî Xalê Mûsa û xwarziyê Hüseyîn re dibêjin ku her dem ji dêvla we û tevahîya sehidîn çapemeniya Kurdistanê emê binîvisin.

SALIHÊ KEVIRBİRÎ

ÇAVDÊRÎ



MÎRHEM YİĞİT

Ferq û girîngiya 15'ê gelawêjê

Giş roj ne yek in, tişte rojan ji hev cihê dike naveroka wan e û bandora wan a li ser pêşerojê ye. Bûyer û roj hene, giş welat bi wan dihese, dibin destpêka jiyan û qonâxeke nû. Mana rojan bi naveroka wan û tiştên diwan de diqewimin û tesîra van qewimînan a li ser pêşerojê ve girêdayî ye. Ev ji xwe ya ku rojan ji hev vediqetîne, rojan mezin û dîrokî û serê mirov bi wan bilind an jî nizim dike. Zeman jî li gora karê rojane, berhem û xebatên însen, yan ji mirov re yan jî li dijî mirov diherike, riya xwe dikudîne.

Jî 15'ê gelawêjê û bi vir de zeman ji bo me kurdan kar dike. Deriyê jiyanê li me vebûye. Gelê kurd hatîye cihekî bêveger. Çawa mirovke xort ne mimkûn e li zarokiyê û zarok jî li zikê diya xwe vegere, yê me jî edî em wiha bûne, pişti 15'ê gelawêjê.

Gava gotin tê ser 15'ê gelawêjê çend tişt tên bîra mirov. Berî zayînê keşfa agir ji bo mirovayetiye tê ci maneyê, çapxaneyâ Jin Gutenberg hemîleyek çendî tarîqelê e, felsefeya rasyonalîzma sedsala 17'an, 18'an û wekhevîxwaziya sedsalen. pişte çendî ji bo însen pêwist in. Rola barûdê ji bo şer û pusûlê ji bo mirov zanibe ku berê mirov li ku ye çendî mezin be, ji bo kurdan jî 15'ê gelawêjê wiha ye.

15'ê gelawêjê destpêka gelek tiştan e. Kilita gelek deriyên civakî, kulturî, rewşenbîrî û jînûveavabûna însanê kurd, malbat û ezbeta kurd e. Berî 15'ê gelawêjê nemaze li bakurê welat gelê kurd tevizî bû, xewar û ne li ser hişê xwe bû, qudûmşkestî, bêqiram û behdîlî bû. Jiyana wî tewkîlibû, nîvmîri bû. Bi gotinê biyanî û Ewrûpiyan gelê kurd goka pêlîstinê, bêebûqat û bêxwedî bû. Ne yekî û ne jî tifaq hebû.

Civat nexwes bû, psîkoloji xerabe, mentalite û mîjî arqozkî û belelêketî bû. Xelk bêhêvî û bixwenebawer bû.

îro ne wiha ye. Ew gel çûye yekî din hatîye. Ne tembelî û tiraletiya berê maye û ne jî sersari, xof û duduliya döh. Em bi gel û neteweyekî din re li himber hev in. Giş movikên civatê di nav guhertinê de ne. Têkiliyên nav jî û mîran ketine wareki din. Hest, his, exleq û kulturek din ava dibe. Giş kategorîyen civatê gundi û bajarî, xezan û dewlemend xwe binuh vedikin. Rewşenbîr ne mîna berê ne. Her komik û tebeqe hînekî hişyartir e, bêhtir organize bûye û bi ji şûrtîr rojên xwe dubûrine.

Li vir tişte aktûel û tê xwestin ew e ku em divê felsefe, siyaset û serokayetiye 15'ê gelawêjê baştır nas bikin, baştır dîraset bikin û baştır hezim bikin. Divê mirov felsefeyâ 15'ê gelawêjê ne bi tenê wekî rojek tegandinê bigire dest. Berê jî kurdan pir caran rahiştine çek û derketine serê ciyan. Lî rahiştina çek û cûna serê ciyan tim nebûye 15'ê gelawêjê. Tiştek heye ku 15'ê gelawêjê kiriye 15'ê gelawêjê. Ev ji siyaset, ideoloji û ew serokayeti ye ku bûye xalîqê vê rojê.

Instituya Kurdî dixwaze ber bi



Instituya Kurdî ya Stenbolê ev 5 sal in ku ava bûye. Heta vê ga-vê hin xebat di bingeha Înstitû-yê de hatine kirin, lewre jî iro li gorî pêvajoyê hûn dixwazin ci xebatê bikin û projeyên we yê ji bo pêşerojê ci ne. Hûn dikarin der barê van de hin agahî bidine me?

● Li gorî tiştê ji Înstitûyê tê xwastin ku Înstitû dikare bike pir hindik hatin kirin, lê belê hinek sedemê wê jî hene, ez naxwazim li ser sedeman rawestim. Teví ku di her warî de pêşveçûnek heye di warê akademîk û zanistiyê de, ci-ma xebat nehatine kirin ez li ser vê jî nasekinim. Bêhtir emê ci bikin? Ez dixwazim li ser vê mijarê rawestim. Berî şes mehan ku kongrega me ya dawîn li dar ket, me hin xebat dane pêşîya xwe. Di nav van de xebatâ amadekirina ferhengeke tirkî-kurdî, kurd-tirkî û ji bo pêşketina zimanê kurdî qursên zimanê kurdî, gihadina kadroyan, xebata berhevkrina tiştê zargotinî, avakirina pirtûkxaneya Musa Anter û arşîv û dokumantasyon. Pişti kongrega me ya dawîn di 6 mehan de me qursek ji bo per-werdehiya zimanê kurdî li dar xist, kesen ku besdarî qursê bûn bi giştî mamoste bûn, nêzîkî 18 kesan ev qurs qe-

dand. Sedema lidarxistina vê qursê ev bû ji bo ku ew kes li hin cihan dersên ziman an jî edebiyata kurdî bidin. Ji bili vê jî me li navçeya HADEP'a Bahçeliyevlerê qursek da ji bo xwendin û nivî-sandinê, nêzîkî 20 kesan besdarî vê qursê bûn a niha li HADEP'a Fatihê qurs tê dayîn, di vî warî de em hinekî bi ser ketin, lê payîzê emê dest bi qursên akademîk, yê ji bo gihadina kadroyan û hem jî li derveyî Înstitûyê bikin.

Me ji bo xebata zargotinê komîsyonek ava kir, hevalek ji NÇM'ya Edeneyê, yek ji NÇM'ya İzmîrê û hevalekî ku vê gavê di Zanîngeha Ziman, Dîrok û Cografyayê de asistan e, ew heval li wir li ser folklorê û li ser zimanê gelan dixebe, di vê komîsyonê de cih digire. Hevalek ji Erzeromê, yek ji Amedê û çend kes jî ji Stenbolê di nav vê komîsyonê de ne. Em serê sê mehan carekê dicîvin, tiştê ku hatine berhevkrin emê wekî berhemên Înstitûyê çap bikin. Heta niha nêzî du kitêban hatine berhevkerin, wekî çîrok, zargotin, gotinê pêşîyan; pişti ku me ferheng çap kir, emê wan jî çap bikin.

Di warê pirtûkxaneyê de bi rastî jî kêmasiyeke mezîn li Bakur heye, helbet sebebîn wê pir in. Ji ber ku tu saziyên me nikaribûne tiştîn hêja li cihekî bicivîne, lewre ew di êrişen dewletê de hatine birin, hatine çirandin, şewitan-din. Me got ku ew tiştîn çûne me ci bi dest xistiye wekî nûshayekê be jî li vir bi cih bikin, wekî navendê. Kesê ku dixwaze der barê kurdan de tiştîkî hîn bibe, bê li vir jê hîn bibe. Bi rastî em di vî warî de bi ser neketin. Ev jî hinekî karê madiyetê ye. Piranya tiştan jî li derive ye, wekî li Rûsyâ û welatên ere-ban ev jî dive sazî li ser bise-kinin û Sten-bolê wekî na-vend bîhesibî-nin, pirtûkxa-neyekê ava bi-kîn. Her wiha em dev ji ava-kirina vê pir-tûk x a n e y ê bernadin.

Ji bo arşîv û dokumantas-yonê der heqê kurdan de ci hebe; wêne, kaset, pirtûk pir caran mi-rov jê istifade dike. Berî vê kesekî ji me re belgeyeke ser-

keftinê ku di medreseyan de hatiye dayîn ji me re anî, yekî jî ji me re belgeyeke zewacê ku berê di nav kurdan de he-bûye anî.

Pir daxwaz ji me re hatin ku em ferhengekê amade bi-kin, ci kesen ku hatine Înstitûyê û ci cihêن ku em çûn lê geriyan, gel bi awayekî, ferhengeke birêkûpêk ji me xwest, ev hinek jî avabûna MED-TV'yê jî tê, wekî hin peyv li cihekî têne zanîn, li cihekî nayêne zanîn. Gel xwast ku em bi ferhengekê vê valahiye dagirin. Me di nav xwe de komîsyonek ava kir, pira-niya hevalan jî xwest ku ferhengeke bingehîn bê amade-kin bi kurdî-tirkî, tirkî-kurdî bi vî awayî me bîryar da. Heta niha 5 ferheng wekî piroje-pêşnûma ji me re hatin, wekî hin kes mamoste ne an jî hinek li gorî xwe ferhengan çedîkin, ji van pêncan ancaj ji %20 ku emê bikaribin jê istifa-de bikin, ji ber ku piraniya peyvîn di wan ferhengan de têne zanîn, ji bili wan xebateke Feqî Huseyîn hebû li ser ferhengê, wî xebata xwe teslimê me kir, emê wê xebata wî jî tevli ferhenga komîsyona Înstitûyê bikin. Ci ferhanga Torî be, ci ya Îzoli be ji bili wan, ferhenga Eli Seydo bi tipen erebî heye, emê ji wê jî tipguhêziyê bikin, wê jî tevli ferhengê bikin.

Armanca we ya ji xebata zargotinî ci ye, hûn dikarin vê hinekî din vezin?



Cigirê Serokê Înstîtya Kurdî ya Stenbolê Hasan Karîm

ber ku ji nîvîskî bêhtir devkî ye, edebi-yata devkî pêş ketiye ji bo edebiyatete-ke xurt, ji bo muzikeke xurt, ji bo dîro-keke xurt zargotin pêwist e, kaniya hemûyan folklor û zargotin e. Me ji ber vê yekê xebateke wiha da destpêkirin.

Ji xebatê akademîk mebesta we ci ye? Yanê dema qala xebatê akade-mîk tê kirin, gelo hûn dixwazin di vî warî de xebateke çawa pêk bînîn?

Hûn ji kîjan nîvîskarê bipirsin ew jî dadixuyînin ku edebiyata kur-dan a zargotinî pir dewlemend e. Em li Romana Yaşar Kemal Mihemedok (Ince Memed) binîhîrin motifîn wê bi kurdî ne, wekî ji nexşen çadîre bigire heta xençera zérîn û tore, edet, lehengiya qehreman hemû ji torey-a kurdan in. Wekî din tê zanîn ku di dîrokê de her dem zordarî li ser kurdan hatiye kirin, vê li ser çandê edebiyatê û hunerê jî tesireke pir mezin kiriye. ji

● Gelê me ji aliye serokatiyê ve ji aliye rêxistinê ve modern e, nûjen e. Bi tevahî heta ronakbir jî ji civaka feodalî feyzê distîn, yanê iro em bêjin di wa-re xebatê dîrokî de kesen ku xebatê dikin piraniya wan ji medreseyan der-kebine, medrese cihê kurdøyetiye bû, ronakbirê kurdan ji wê derdiketin. Ke-sen xwenda bêhtir, asimile bûne, bêhtir ji gelên din re xizmet kirine, ji çina serdest re xizmet kirine, wekî kesekî ku bûye doxtor an jî dîrokzan ji tîrkan re xizmet kirine. È medreseyê hinekî ji xwe re xizmet kirine, lê hinek ji zanya-



akademîbûnê ve gavan biaveje



sî ye” em çiqas xebatê bikin bi taybetî jî di vê demê de wê kêmâsî hebin. Her wiha ferheng hinek jî ji nav gel tê, ne mimkûn e, ku em xwe bigihêjine her cihî, lê em nikarin bibêjin emê ferhengeke mûkemel amade bikin, ançax emê bikaribin ji %70’ye mûkemeliyê çêbikin. Bi taybetî ferhenga Baran Rizgar û D.İzolî gelek xebatê giranbuha ne û Amed Tigris jî got ezê alikariyê bidime we, wî jî nêzîki 120 rûpelî peyv berhev kîrine. Her wiha Înstîtuya Birûkselê jî di vî warî de wê alikariyê bide me. Niha em li ser gelek kitêban dixebitin, ji çavkaniyêne wekî Hawarê, kovara Kurmancî ku Înstîtuya Parisê derdixe em ıstifade di kin û pirtûkên kurdên Başûr jî em dinirxînin. Heta niha gelek hevalen me di warêni cihê de pir xebat kirine û gelek peyv berhev kirine. Em bêjin li NÇM’ê Jiyana Rewşen, ew jî li gorî xwe peyvan berhev dikin, yanê sazî û xebat hebin di vî warî de ci hebe em wan dikin ser hev, lewma em dibêjin wê xebateke baş be.

Înstîtuya qursen zimanê kurdî jî dide, di vî warî de qadroyen we têrê dikin û hûnê bikaribin di vî warî de bersivê bidine pedîviya gel?

● Bi rastî jî qadroyen me têrê nakin. Piştî vê qursa dawîn ji ber ku me hin kes gihadîn, em dikarin li 20 cihan qursen zimanê kurdî vekin. Ev ançax tenê ji bo xwendin û nivîsinê be. Xaleke din jî heye, em bikaribin li 50 cihî jî

bibin?

● Ev rewş pir dijwar e. Em iro rewşa Stenbolê bifikirin, sed hezar insan wê bixwazin di vî warî de xwe bigihêjîn û zimanê xwe hîn bibin. Lî li Înstîtuyê em dikarin ders bidine 40–50 kesî, li navçeyen HADEV’ê li saziyên demokratik ev bi awayekî dikare bê kîrin. Lî li Kurdistanê rast e, a niha ku rewşa siyasi baş bibe sedhezaran insan wê bixwazin zimanê xwe hîn bibin, di vê rewşê de jî divê rewşeye seferberî bê îlankirin, xebateke wisa ji vê re divê. Ev xebat çêdibe, ne tenê Înstîtuya Kurdi li gelek cihan pêk tê, ji bo yên Kurdistanê emi nikarin bibin derman, li wan deran jî têkiliyê me bi Egit-Sen’ê re hene, em bibêjin ji bo çêkirina bernameyeke mifredatê, mamoste hene ji me dipirsin “divê em çawa vê bernameye çêbikin, divê dersek çend deqe be’ em jî alikariya wan dikin, ci dokumanan ji me dixwazin, em didine wan.

Di warê siyasi de ci xebatêne, wekî ji bo aştiyê an jî di mijarê din de wekî lidarxistina konferansan ji projeyen we heñe?

● Di salêñ borî de çend civîn û konferansen bi vî rengî li dar ketin û niha jî pêwistiyek pê heye. Li gorî ku hûn jî dizanîn trêna aştiyê ya ku wê ji Birûkselê bi rê bikeve here Amedê, bernameya wê kete destê mî, emê jî li vê derê tiştê ku ji destê me tê emê alikariya wê bikin.

Berhemî Înstîtuyê, Kovara Zend ji destpêkê heta niha hinekî bê rîkûpêk derket. Lî tiştê ku we got ji iro pê-

Der barê ferhengê de gotinek heye “Ferhenga herî berfireh jî tijî kemasî ye” em çiqas xebatê bikin bi taybetî jî, di vê demê de wê kemasî hebin. Her wiha ferheng hinek jî ji nav gel tê ne mimkûn e ku em xwe bigihêjîne her cihî, lê em nikarin bibêjin emê ferhengeke tekûz amade bikin, ev jî ne rast e, ançax ewê karibê %70’ye pirsan re bibe bersiv.

qurs bidin, lê ev bi awayê fermî nabe. Heta ku di navbera pêşengên kurdan û dewleta tirk de peymaneke fermî çênebe ev baş pêk nayê. Em doza fermibûnê dikin, dewlet jî rî nade vê yekê, ançax rewşa siyasi were cihê xwe, wê kar baştar bimeşe.

Niha ez bawer im ku pir mamosote kes dixwazin li ser zimanê kurdî xwe bigihînin û li cihan dersen zimanê kurdî bidin. Ev ïnsan, bi taybetî jî yê Kurdistanê dikarin xwe çawa bigihînin we û çawa dersen zimanê kurdî

de wê bi rîkûpêk derkeve. Gelo herkes dikare xwe têde bibe?

● Niha em bibêjin Zend kovareke wêjê, arkeolojî, felsefe û hwd. di vî werî de hedefa me ew e ku em Zendê ji bo her çar parçeyen Kurdistanê û cihênu ku kurd lê belav bûne têxin dergehê hemû kurdan. Em bi rojhîlatê Kurdistanê re, bi Navenda Çanda Selahatinê Eyûbi re, bi Qazî Elewî, Ehmed Qazî re ketine têkiliyê û Merhad Izady ku kurdzanek e ku li Amerikayê diji, em bi wî re jî ketine têkiliyê, wekî din ci Înstîtuyen

ku hene em bi wan re dikevin têkiliyê. Bi kesen ronakbir rewşenbir re me têkili danîn ji bo ku kurd bikaribin bi zimanê xwe zanînê zanistiyê bisopînîn.

Mirov dikare bibêje wê di rojêne pêş de Înstîtuya Kurdi bibe akademî ji bo kurdan?

● Bi rastî berê hemû kurdan li Bakur e. Berê kurdên Bakur jî li Amedê ye, pirsgirêka kurdi çareser bibe, wê gavê em dikarin li Amedê li Heranê ku cihê Kurdistanê herî kevnare û şaristaniya dirokê ne em dikarin li wan de rana akademîyan ava bikin.

Di warê zargotinê de gel dikare çawa alikariya we bike?

● Gel dikare pir tiştan ji me re bike, weki kasetek, nivisetek an jî peyveke ku nayê zanîn dikare li ser pelên cixarê binvisîne ji me re bişne. Ci tiştê dirokî berhemîn hêja, kevir be jî gel dikare ji me re bi rê bike, ji bo muzyeke hêja ev pêwist e.

Di van xebat û projeyen ku we dane pêş xwe de şansê we yê serkeftinê çiqas e?

● Gav em karibin jiyana gelekî, edebiyat û çanda vî gelî derxin holê, bi pêş ve bibin, serkeftina ew e. Niha dibêjin Universiteya Sorbonê, Cambridge, Oxford ji bo ci bi navûdeng in? Ji ber ku xwedî dewletên xurt in, ew di warê siyasi û aborî de jî xurt in. Li Kurdistanê jî bi vî awayî çareseriyeke siyasi pêk were, helbet wê serkeftin jî pêk were. Wê demê emê bi ser bikevin. Ev nayê wê maneyê ku rewşenbir, ronakbir li mala xwe rûnin, ev der jî xurt nabîn, dema ku kurd rabin bibine xwedî heq, xwedî dewlet wê gavê serkeftina me cîma çenebe.

Astengiyen li ber we ci ne?

● Pirsgirêka yekemîn astengiyen ku dewlet li hemberî me derdixe ne. Bi awayekî din Înstîtuya Kurdi ne tenê Înstîtuya Bakur e, ya hemû Kurdistanê ye, ji ber ku têkili bi parçeyen Kurdistanê yê din re danîn jî, hinekî dijwar e û rewşa aborî jî hinekî astenge, gihadina kadroyan jî astengiyê derdixe pêşberî me.

Tiştên ku hûn dixwazin dawîn bibêjin...

● Bi rastî Azadiya Welat di warê xwandin û nivisandina zimanê kurdî de derfeteke mezîn e ji bo gelê me, em serkeftinê ji xebatkarên wê re dixwazin. Em ji têkoşına gelê xwe re jî dibêjin teqez wê bi ser bikeve.

HEVPEYVİN: M. AGIRI

riyê dûr ketine tevî ev herdû yê ku ji gelê xwe re xizmet nekirin û yê ku ji xwe re xizmet kirine bi awayekî zanîsti bînin ba hevûdin, bi hev re xebatê bikin. Ev jî li gorî ilm, li gorî diyalektîke xebat kirin e, ji xebata akademîk uestev e.

Ez bawer im ji bo ku hûn pirtûkxaneya Apê Musa pêk bînin we ilan jî dane rojnameyan, ji wir tiştê derket gelô? Kesê ku bixwaze di vî warî de alikariyê bide we, dikare ci bike?

● Di vî warî de em bi ser neketin, çima? Ez vê bibêjim ci pirtûk bin, ci tiştê din bin di destê kesen xwende de bi awayekî baş me xwe negihandine wan û kesen li Ewrûpayê, li Amerikayê jî ber ku pir kes pirtûkxaneyen wan di malen wan de ne.

Li Tirkîyê gelek berhem hatine destê me, lê tiştê ku me dixwest ne ew bûn, bêhtir di vir de kêmasiyâ me heye, lê belê aborî jî girîng e. Divê du heb makîneyen baş yê fotokopyê hebin, wekî birêz Kaya Muştakan û Cemşid Bender pirtûkxaneya xwe pêşkêşî me dikin û di destê wan de pir berhem jî hene, lê ew dixwazin em berhemîn di destê wan de kopî bikin.

Em werine ser ferhengê, gelo ferhengê ku hûn amade dikin wê pêdiviyen gel bîne cih? Çiqas berfireh e?

● Der barê ferhengê de gotinek heye “Ferhenga herî berfireh jî tijî kemasî

Binefşa Narîn û Cembeliyê

Mîrê Hekarî -VII-

Dewrêş dibêje: "Binefş, ev salek e te bi min re xeber nedaye, iro te bi min re xeber day, ezê bi xwe herim ber pez, bila şivan were malê." Dewrêş Beg dimîne li ber pez, Cembeli serê xwe dişû, Binefş ji Cembeli re destek kincê teze tîne û li Cembeli dike. Cembeli jî rihê xwe dibire, birînê lingê xwe derman dike û Cembeli û Binefş li hemberî hev rûdinin, derd û kulên xwe ji hev re dibêjin. Çi hatiye serê Cembeli tev ji Binefşê re dibêje. Binefş jî jê re dibêje: "Bavê min rabû ez li Dewrêş Begê mar kirim, lawekî Dewrêş ji min heye, min jî navê wî danî Cembeliyê biçûk." Binefş dibêje Cembeli tu rabe xwe dirêj bike, qasek xewa xwe hilde, heyâ ez ser û çekêñ Cembeliyê biçûk bisûm û ji me re du heb hesp hazir bikim ku em bi rê bikevin û herin.

Cembeli serê xwe diavêje xewê, Binefş Xanim jî radibe hespa hazır dike, ser û çekêñ Cembeliyê biçûk dişû, wî dixe hundirê hêlekanê, lehêfa wî dikişine ser çavêñ wî. Cembeliyê biçûk dest bi girinê dike, Binefş di navbera nivînê Cembeliyê mezîn û hêlekana Cembeli yê biçûk de neçar diñnîne; Cembeliyê mezîn ji ber birîna xwe dinale, Cembeliyê biçûk jî di hundirê hêlekanê de digirî, Binefş jê şas dimîne, nizane ci bike û wiha dibêje:

*De lori, lori, lori, lori, loori lori
Wey xwedê yo dilê min dibê yo
Ezê bigirim û bibejim ji bo derdê
di nê yo
Ezê bêjim ji bo Cembeli yê biçûk di
girî li hundurî hêlekanê yo
Ezê bigirim ji bo Cembeliyê mezîn
dinale di nav nivîna û li ser
dosegê yo
Ezê bigirim ji bo Dewrêş Begê
Ji bo xatirê Binefşê, çûye ber pez, ke-
tiye nava kulavê şivaniyê yo
Wey rebî xalîgo ka tu ci dibêjî ji bo
derdê min hermetê yo
Lori, lori, lori, loori, loori Cembeli
yê min loori lori*

Bi van gotinêñ Binefşê re disa Cembeliyê thezin serê xwe ji nav nivîna ranake. Binefş careke din dest pê dike, dibêje:

*De lori, lori, lori, lori Cembeliyê min
loori lori
Cembeli yê min de tu rabe ji xewê yo
Serê xwe bilind bike ji ser balîf yo
Işev ji évara Xwedê de xew neketiye
çayen min hermetê yo
Serê min neketiye ser balîf u
dosegê yo
Cembeliyê biçûk digiri li nav hêleka
ne yo
Wê dengê wi here cezuya xwesiya
min
wê cayebê bide Dewrêş Begê yo
De tu rabe ji xewê yo*

*Hin Dewrêş Beg ji ber pez neziviri
malê yo*

*Em siwar bibin li pişta hespan bice
dînin rê û dirbê yo
Ezê Cembeliyê biçûk bîhêlim li ber
desta û li hêviya xelkê yo
Ezê bidim pey Cembeliyê mezîn berê
xwe bidim Hekariyê yo
Lori, lori, lori, lori, Cembeliyê min
loori lori*

Wê demê Cembeli serê xwe ji xewê radike, bala xwe didê nêzikî destê sibê ye, Binefşê du heb hesp zîn û gem kiriñe, hatiye li ser cihê Cembeli sekiniye, Cembeliyê biçûk jî di hêlekanê de qêrîna wî ye digirî. Binefş ji Cembeli re dibêje hey malmîrat rabe, em bi rê bikevin hîn

dibin, Cembeli dibêje bila hinek hespên me biçerîn, em jî hinek bêhna xwe bidin û emê careke din rabin siwar bin û riya xwe bidomînîn.

Cembeli ji Binefşê hinekî dûr rûdine, bala xwe didê Binefş bi made ye, Cembeli gazî dike, dibêje: "Binefş, qey tu poşman bûyi, eger dilê te bi Dewrêş re hebe, ezê te sun de bibim mala Dewrêş." Binefş jî jê re dibêje: "Di dinê de dilê min di yek mirovekî de heye, ew jî tu yî, lê belê min ji êvarê de Cembeliyê biçûk nemêjandiye, bistanê min tijî şîr bûne, halê min ji ber bistanê min tune ye." Cembeli dibêje: "Binefş, ez ne mirovekî ew qas bê esil im ku dergûşa ber pesîra di hêlekanê de bîhêlim û birevim. Cembeliyê biçûk dide Binefşê, Binefş dergû-

vîna radibe, bala xwe didê ku ne Binefş, ne lawê Binefşê û ne jî şivan di mal de ye. Dayika Dewrêş Begê radibe xulameki dişine pey Dewrêş Begê, Dewrêş Beg pez dihêle, bi rê dikeve, tê malê bala xwe didê ku êla wî tev xwe res girêdane, Dewrêş dibêje: "Dayê ci qewimiye?" Dayika wî dibêje serê te bixwe, bi ser te û axatiya te de jina te rabûye daye pey şivanekî pê re çûye. Dewrêş êdi fêhm dike ku ew şivan Cembeli ye. Dibêje eger ku hinek bi esil be wê li hêviya min bisekiñe, jixwe ku bê esil be ewê bireve, here.

Dewrêş qefleyek siwar bi xwe re siwar dike û dikeve pey Cembeli, pir tê hindik tê, xwe digihîne cihê ku Cembeli li wir sekiniye. Dewrêş gava ku hespê Cembeli dibîne, ricafek dikeve bedena wî, tirseke wisa dikeve ser Dewrêş ji xwe re dibêje: "Bi Xwedê Cembeli wê min bikuje. Dewrêş Beg li Xwedê dia dike û wiha dibêje:

*Wey Xwedêyo; wey Xwedêyo, tu serê
vi çiyayê bi mij û bi
duman kî*

*Tu min û Cembeliyê Mîrê Hekariya
li hevdû rast neki*

*Li hemberî xulama min rezîl û rîswa
neki*

*Tu ji teref xwe de ba û bagerekî rakî
Temamî xulam û xizmetkaran li hevdû*

*şas biki
Şopa Cembeliyê Mîrê Hekariya ji
ber wan winda biki
Sûn ve wan bi ser êlê de rast kî*

Wê demê ji teref Xwedê de dibe bager, baran, şili û firtonek, xulam tev li hev şas dibin û xulam û Dewrêş Beg hev du winda dîkin, xulam digerin-nagerin Dewrêş Begê nabînin û xulam sun de vedigerin nava êlê. Pişti ku xulam vedi gerin nava êlê ba û bagera şili û baran di sekine, Dewrêş Beg û Cenabîl her du rastê hev du têñ û li hemberî hev disekinîn. Dewrêş Beg serê xwe bilind dike, dibêje: "Cembeli, ji te re oxira xêr be, helbet ev tiş di çarenusa (qeder) me de hebûye, lawo here bila ev mérani ji te re be. Min bi Binefşê re heqaret kir, ji ber ku Binefş evîndarê te ye bila Xwedê mirazê me bi hev bike.

Li ser van gotinêñ Dewrêş Begê Cembeli jî dibêje hindî ku tu ev mérî, ezê ji te bibim nava êla xwe, xwişka xwe li te mar bikim û paşê te bişnim nava êla te.

Cembeli Dewrêş Begê bi xwe re hil dide, tîne mala xwe, xwişka xwe li Dewrêş Begê dide markirin û bi mesrefekê mezîn, gîran û bi hêle mîl Dewrêş dişine nava êla wî. Pişte ji bo xwe û Binefşê ji çil roj û çil sev def û dawetê dike, ew bi mirazê xwe şah dibin, em jî bigihêjin daxwazî û mirazê xwe.

BERHEVKAR: SERVET YÜKSELİR
(DAWI)



ku tav derneketiye bila kes me nebîne.

Gava Cembeli û Binefş li hespa siwar dibin bi rê dikevin, Cembeli bala xwe didê ku Binefş lawê xwe bi xwe re neaniye Cembeli dibêje: "Binefş tu hêdi hêdi hespê xwe bajo, min qama xwe li malê ji bîr kiriye, ezê herim qama xwe hildim, werim bigihêjim te."

Cembeli sun de vedigere tê malê, Cembeli yê biçûk ji hundirê hêlekanê deridixe, dide ber hembêza xwe û ji paş ve vedigere, tê digihêje Binefşê. Cembeli, lawê Binefşê vedîşêre, nade nişanî Binefşê û riya xwe berdewam dîkin, pir tê, hindik tê li wan dibe sibe, tav li wan dertê, ev li binê çiyê ji hespan peya

sa xwe dimijîme. Binefş jê re dibêje: "Cembeli rabe em riya xwe bicedînîn, hîn ku Dewrêş û êla (esir) xwe li pey me neketine."

Cembeli dibêje: "Binefş, bi Xwedê ez ji vê derê naçim, eger ez ji vir herim, Dewrêş wê bîbêje ku Cembeli, newêrek bû, ew mérani pê re tunebû ku bi min re şer bike û bi min re bêbextî kir, revi çû." Ezê li vê derê bisekinîn, heya ku Dewrêş Beg tê vir. An ewê min bikuje te ji min bistîne û te bi sun ve bibe nava êlê, an ji ezê wî bikujim te hildim bibim." Bi la Cembeli li vir bimîne, em werin dora Dewrêş Begê.

Dema dayika Dewrêş Begê li nav mi-



Li Navendê Çandê Çalakiyên vê hefteyê

Li NCM'ya Stenbolê

● 08.8.1997 **Yeksem:** Teatra Jiyana Nû "Roj Baş", saet: 14.30

Beşa sînemayê film: Diktatorê Mezin

Derhêner: Charli Chaplin, saet: 18.00

● 09.8.1997 **Şemî:** Konser Korna Amed

Beşa sînemayê film: "Ên ku ji bihûstê hatin avêtin", Derhêner:

Franciscos Lambordî, saet: 18.00

● 10.8.1997 **Yeksem:** Konser Salihê Qûbînê saet: 14.30

Ji beşa sînemayê film: Diktatorê Mezin, saet: 18.00,

Derhêner: Charli Chaplin saet: 18.00

Li NCM'ya İzmîrê

● 08.8.1997 **Yeksem:** Belgefîlme: Ismail Beşikçi saet: 18.30

● 10.8.1997 **Yeksem:** Konser Ismet Dağ, saet: 18.30

AWIR

Rewîngiya ji koletiyê ber bi azadiyê: August King

Di nav baweriyên batînî û edet toreyên eşirkî de gera li azadiyê dilekî wêrek di-vê. Jibo azadiyê gelek kesan canê xwe feda kirin û hê jî dîkin. Meşa azadiyê di nav tirseke mezîn û li cihekî bê edalet û bê qanûn bi ras-tî gelekî zor e. Digel vê yekê meşa ber bi azadiyê ku di salê 1815'an de be, hê dijwartir e. Vê dînyeya mezîn ku nikaribin li hev û du parve bikin û di nav sipehiyên xweza-yiyê de xwedî taxên mezîn, însana dikin koleyê xwe û wekî sewala didin şixulandin ku, bi tenê bigihî-jin zewqa xwe. Belê li hemû dîn-yayê wiha ye "diranê kê di kê de biçe, li ser piştâ wî siwar dibe."

Ev cîhan bûye cîhana xwedî ta-xên mezîn, bûye cîhana kesen bi pere û bi qewet. Hemû zagon û qanûna ew çedîkin û ew radîkin, her-tim jî ev zagon û qanûn li gorî ber-jewendiyê şexsi an jî li gorî kabî-leya serdest xwedî biryar e. Hine-kan jiyan, digel hemû xwişkahiyên xwezayî qeyd û bendan kirine do-jeh ji hinek mirovan re.

Tiştê ku me li ser azadî û koletiyê dide fikirandin, filmê bi navê August King e. Di serê film de du kole ji destê Olaf direvin, Olaf, xeberê li her cîhî belav dike, ji bo ku kole bêñ girtin. Qehremanê film August King jî ji serê film heta dawiyê bi awayekî dizi alika-riya kole Annaleesê dike. Di zagonêñ wan de yê ku alikariyê bide koleyan mala wan tê şewitandin. August tê gi-hîştiye ku li ser rûyê erdê ji insanan pêştir zindiyêñ din jî hene. Her çiqas ew giyanewer weki mal û milk bêñ dî-tin jî, ew jî xwedî hest in.

Li aliyeke Olaf, bi zilam û kûçikêñ xwe li Annalees digere. Li aliye din jî August ji bo ku keçik nekeve destê Olaf, ci ji destê wî tê dike. Li ser vê ye-kê August çelek, qazû berazê ku kiribû ji bo azadiya Annalees feda dike. Temâsekirina li hin sahneyan bi mirov hinekî zor tê. Di film de jî Olaf xwedî ta-xa mezîn hevalê Annalees bi dest dixe û li ber çavêñ gel, wî bi satorê dike du perse, di vê navberê de Annalees di erebeya August King de li vê bûyerê temâse dike. Tu tişt ji destê wî nayê. Ji ber ku dabûnêriten wê demê wiha ne.



Armanca August ev e ku Annalees bigihîne mala xwe. Bakur nêzî mala wî ye, riya bakurê azad di ser wan girêñ li pişt mala August King re derbas dibe. Digel ev qas asteng û dijwariyêñ mezîn jî digihîjin mala August.

August wê dibe ser girêñ azad û di-bêje; ji vir û pê de wekî zêr wê riya te ronî be. August vedigere mala xwe û ji Olaf re dibêje min alîkarî da Annaleesê, Olaf jî dibêje li gorî edetan divê mala te bê şewitandin. Paşê jî Olaf ra-dibe mala August a ku di çar salan de bi gelek zahmetiyêñ mezîn hatîbû çêki-rin, dişewitîne. Belê August di dawiyâ film de li hember vê yekê dibêje: "Ez tu caran ev qas serbilind nebûbûm." Filmê August King her çiqas ji aliye naverokê ve hinek qelsiyanbihundirîne ji, bi taybeti ji ber xurtbûna aliye dîtbâri ve film, hêjayî dîtinê ye.

Derhêner: John Dragoon Listikyan; Jason Patric, Thandi Newton, Lerry Drake. Senaryo: John Ehle

AZAD ALTUN

TÎŞK

LERZAN JANDIL



Dîrokê de yew rûpela barbariye

Mi waştene ke ez nê nivisê xo de perwerdekerdene, metod û didaktikê dayê ser ro binivisnê. La belê na miyan de ez şîyanê Munchen. Nêzdiyê Munchen de şaristanê (şehir) Dachau (Daxau) esto. No name meşur o. Dîroka NSDP (Partiya Nasyonalşosyalîsta Karkeranê Almanya) de 22.03.1933 de KZ'a (Kampa Komkerdene) yewîne Dachau de ama avakerdene.

Ez ke kampe de céranê (gérane) tim welat û welatê ma de kerdenê amê mi vîri. Mi nivis û plakatê ke naca muzede rê, kerdenê nazîyan, metodê karê dînan û ê şîyanê, ke welatê ma de biyê, şaneyî tê ver. Xem û xeyalê mi şî Koçgîrî, Rewandiz, Silemaniya, Sason, Pîran, Dara Hêne, Zîlan, Dêrsim, Mehabad û cayanê bînan yê welatê ma. Xem û xeyalê mi şî seranê 1933, şî Dachau, şî kampe barbariya nazîyan, feqîrî û bêkeşîya guretiyan ûeb. Mi, naca xo bi xo vat, xezila îmkana kesan bibiyêne her kurd, her tîrk, her erek û her ecem bişîkiyêne biyamêne na welat, na barbariye bidiyêne û ebi barbarianê welatê xo, dewleta xo têverşanitêne, ke hela ekamî tayı-na giran amêne.

Ez nîwazena na kañpe ser ro zêde binivisnê. La belê ganî mordem bizano na kampe çinayî re amê avakerdene. Na kampe virendiye seba komünîstan, sosyal demokratan û kesanê bînan yê ke hemverê Naziyan vecîne, amâ fikiryene. La belê bado kaleka nê kesan de, kesê binî jî ardê na kampe. Eke Nazî kewfî welatanê bînan, mordemê vengûvacî yê nê welatan, cuhidî, aşiqî (mitribî), gureteyê cengî ye ke Sovyetî ra ardî bî, ardê na kampe û nê mordemî seba xo dê xebatnayene. Eke nê îndî nêşîkiyât bixebeitîye jî amê kîstene. Ebi vêşaniye, ebi zilum, işkence, qerqeşune, darde kerdenê amê kîstene, nêweşîye ra, vêşaniye ra merdi.

Bê guman kesê ke elaqaya xo bi politika esta, tenê dîroke wenda, rînd zanê ke eleqaya îttîhat Terakkî û almanan, bado, ji eleqaya Naziyan ebi dewlate, ebi kemalîstan biya. Na elaqaya her heth jiyane de biya.

La belê na rînd nîna zanayene. Eke mordem prosesê avêşiyena Naziyan de niyado û na avêşiyene ebi avêşiyenê zerî Tîrkiye, hem demê osmanîyan de, yanê demê îttîhat Terakkî de û hem jî demê diktatoriya yew partiye de bişano têver, mordem şîyanê zê yewbînan zaf rînd vîneno.

Nê zê yewbiyenan demê Abdulhamît de dest kerdo ci. No dem de û bado 1915 de qirkerdene ke hemverê hermenîyan (armenîyan) ama kerdene de bêcîke Almanya, hetkariya almanan esta. Qirkerdene kurdan de, şaranê şenikan de hetkariya Almanya esta. Na hetkariye welatê ma de sera 1937-1938 de mordem şîkîno zaf zêlîl bîvîno. Yanê hetkariya ke naziyan seba qirkerdene şarî ma yê Dêrsimî da kemalîstan hêñî dizdêniya niya. Na hetkariye hem eşkera wa û hem jî bêhemd zaf a.

Ez wazena naye ra tepiya nê eleqayan ser ro vinderî. Çike nê elaqayan teyna hetê politika de, hetê cengî hemverê kurdan, komünîstan de niya. Her hertê jiyane de, hetê perwerdekerdene, ekonomî, bûrokrasi, ideolojiyê resmî, avêberdانا ideolojiyê rasîzmî de na eleqa esta. Na eleqa sistemanê hurdimîn dewletan de estâ. Na elaqe organize biyena dewlete û bûrokrasiyê hurdimîn dewletan de estâ.

Her çiqas xêlê kesî nayê bizanê jî, gumra kesî estê, ke nayê nizane. Nê kesê ke naye nizane, teyna wertê kurdan de, tîrkan de niyê. Hama hama almanî pêro, bê işsîşnayan, kemalîzmî zê avêşiyene, zê sîvîfîzasyonê de rojavayî vînene. Gani na bawariya şase û bê bingeyîne bêro vurnayene û angorê naye analîze dîroka Tîrkiye û şarê ma bêro kerdene.

Çend dûrik û metelokên herêma Mêrdînê

Rêka Mêrdîn xwaromaro

Me hevala xwe bi rastê xist xêlika xwe ber bayê xist me agir bi dilê dê û bavê xist

Ha li kela, ha li kela
koç û kerya da mexela
tu qîza feqîra bû
bû bûka axalera

Çi sindoqa çingî vala
şewqê da kaş û newala
lê lê xwakê te negot
ev sindoqa her nav şîrîk û hevala

Rêka Mêrdîn xwaro maro
jê derket cotek karo
siwarê pêşiyê bavê lezgîn
şewqe xwar
Bavê bûkê pir xesîs e
Pere berda binê kîs e

Hewşa me di hewşa we da
deryê hewşê di qulbê da
wele xwakê
me dixwest û dilê me tê de

Hatin hatin, hatin te yo
bike kar û barê xwe yo
êdî bes bigirî
şîn û girî bê fêde yo

Defa me defa heyatê
def giran e bi teqla tê
xalê bûkê ne tiştek e
ji me dixwaze devanço xelatê

Qerejdaxê bûye ewro
li Derikê derketiye
dismalê
tewl bi tewlo
ezê yekê bikirim
ji hevala wey enya zêr a
enya gewr o

Dûrikên li ser hinê Kekê mino zava

Derket û derkete keko
derket û me nas kir
şaska serî girê dabû keko
ser gul û qeyas kir
bûka kesk û sor bû keko
me ji te re xelas kir

Manî manî manî
kekê mino me anî
rahêl tivingê her ser xanî
kekê mino manî
a ka te digot me ji ter anî
kekê mino manî

Gurmîn e gurmîn e
kekê min çû Mêrdîn e
Topek qurnaş bîne
li ber diya bûkê datîne
wê pê dixapîne
û bûkê direvîne

kekê mino zava

Roka me hilatî

Roka me hilatî
Zerî merî
Şewqa xwe da oda bavê Xelîl
Sarya derî
Roka me hatiye ji aliye millî
Odeka bavê Xelîl ser bi şex ra
Cav bi kilo
Roka me hilatiye ji ali Bota
Şewqa odeka bavê Xelîl
bi qîz û xorot o
Roka me hilatî di sota

Metelok (Jîmarok)

Hê deqê hêna deqê
dexda Sumê
bêlix başî
kumê tito
aro vinga
pî qulingo
hestiyê kewê
kew tiriya
çav rijiya
bista viya

Legelegê hecî begê

Mîr Mistefa
dengê defê
olik kuto
şorbe berda
li ber romiya
heçiyê nexwar
gû li riya

Yekê yekê dayê mekê
hestiyê kewê
li bin kewê
kew tiriya
bista viya

Çê pişê qala qışê
qala genim
çû qurişê
Deşta Müşê
wa bi geneki
sar û peya têd bû yekî
giş xelilê
çav belekî



Hevalka min derxist
bê cil û bê cehiz e

Bavê bûkê çû zozana
Anî hirîkâ berana
Diyâ bûkê xerab bû
Jê re nekir tûrê bêrîvana

Xêliya hevalan dezî dezî
Tê re xuyaye bisk û kezi
Lêlê xwakê xema neke
Va berbû têr bi lez û bezî

Hewşa der newal e
Xwe jê berda xezal e
Eyûnê rû bi xirxal e
dil ketiyê kurxal e

Çavê te çavê şehîn a
biskê te dirêj e
mîna qancokê dermihîna

Şervanê bavê
Şevîn û Newal
ketiye dora Metînia

Çi hêlinâ van çûçika
hêlinâ çekir ser qûçika
xew xwes kiriye li cem keçika

Çi hêlinâ qaz û beta
hêlin çêkir û ser haleta
xew xwes kiriye cem hurmeta

Her hine, her hine
hîneka Mêrdîn e
min kirî bi çapa şîn e
hîne barê mîltîn e

Wer hîne, wer hîne
hîne bîne di teşte kin
kevçî kevçî alê lêkin
berê li destê bûk û zavê kin
dawiyêli berbûyê dorê kin.

Zava zava kekê mino zava
çî zavakî bê dilf bava
kekê mino zava
zavakê li ser kursiyê
kekê mino zava
zava bi dilê xesûye

Hejmara nû ya Kurdistan Report derket



Kurdistan Report

Kovara Kurdistan Report a ji hêla rêxistinê kurdên Ingilîstanê û dostêr kurdan ve tê weşandin, bi hejmara xwe ya tîrmeh û gelawêjê derkete pêşberî xwendevanan. Her weki hêjmarê din, di berga pêşin a vê hejmara de jî dîmenek ji xwepêşandanê kurdan heye. Her wiha li ser wêne gotineke Mebûsê Ingiliz John Austin a bi rengê "Ev serê qirêjî û jenosîda li ser kurdan divê bê rawestandin" cih digire. Kovar bi mesaja Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, ya ku ji Konferansa Aştiyê ya Romayê re şandibû, dest pê dike. Öcalan digel piştgirî û daxwaza serkeftinê ji bo

Ismail Beşikçi di vê nameya xwe de li ser rengê şovenîzma dewleta tirk jî hin nirxandinê hêja dike û diyar dike ku ev cure şovenîzm ji ya Afrikaya Başûr jî xerabtir e, lewre rejîma nijadperest cihê xwe ji sistemeke demokratik re hişt, lê nijadperestiya fermî ya dewleta tirk hê jî li ser piyan

konferansê, li ser wateya şerê PKK'ê û doza gelê kurd bîr û ramanê xwe pêşkêş dike. Sernavê nivîsê bi vî rengî ye: "Berkwedana me şansê dawîn bû ji bo ku kurd li serê rûyê cihanê wekî gel bijîn".

Ji bili vê nivîsê hinek nivîsên ku ji weşanê din hatine wergirtin jî di vê hejmara kovarê cih girtine; wekî nivîsa Haluk Gerger "Şerê li dijî demokrasiyê", nivîsa David McDowall "Tirkîye şer xwe yê bi kurdan de re dinirxîne" û nivîsa Stephen Kinzer ku ji New York Timesê hatiye wergirtin: "Li Tirkiyeyê têkiliyên di navbera polis, siyasetvan û súcdaran" û hwd.

Tîştekî ku vê kovarê cihêrengitir û dewlementir dike jî ev e, piraniya heyet ên ku tê Kurdistanê çavdêriyê xwe ji bo kovarê dinivîsin. Bo nimûne di vê hejmara de heyeta itâli ya ku di navbera 18-23'ye adarê de çûbû Başûr, çavdêriyê xwe yên li ser baregeha Etrûşê nivîsîne. Her wiha heyeta ku di Newrozê de ji bo çavdêriyê çûye Bakur jî çavdêriyê xwe nivîsîne. Dîsa delegasyona Sendîkayê britanî ku di 27'ê gulanê de çûne Amedê, dîtinê xwe di bin sernavê "Em li hemberî asta pest û kotekiye ku heye, şoke bûn" aniye zimê.

Di vê hejmara Kurdistan Reportê de hinek nivîs û daxuyaniyê li ser "Kampanya Boykotê ya Turîzma Tirk" jî cih girtine. Kurd û dostêr kurdan li seranşîrî Ewrûpayê ji bo gelê ewrûpî turîzma tirk boykot bikin, kampanyayekê dimeşinîn.

Nameya ku Mamoste Ismail Beşikçi ji Prof. Dr. Andeas re şandiye rengekî taybet daye vê hejmara kovarê. Di vê nameya de Mamoste Beşikçi li ser azadiya derbirinê, rewşa kurdan û parçebûna Kurdistanê bi dorfirêhi ratiweste. Pişt re jî ew dide zanîn ku heta bi awayekî zanîst neyê fêmkirin ku çima gelekî bi 40 milyonî nebûye xwedî dewlet, ne gengaz e ku rewşa kurdan bê analîzkirin.

Mamosta Beşikçi bi taybetî sernavê rojnameyê tirk ên piştî biryara Parlementoya Ewrûpa ya diyaloga ku kurd û tirkân dixwest, bi bîr dixe. Piraniya rojnameyê tirk ew roj wekî "roja reş" bi nav kiribûn. Bi vî awayî jî mamosta helwesta çapemeniya tirk a li hemberî aştîyê nîşan dide.

Ismail Beşikçi di vê nameya xwe de li ser rengê şovenîza dewleta tirk jî hin nirxandinê hêja dike û diyar dike ku ev cure şovenîzm ji ya Afrikaya Başûr jî xerabtir e, lewre rejîma nijadperest cihê

xwe ji sistemeke demokratik re hişt, lê nijadperestiya fermî ya dewleta tirk hê jî li ser piyan e.


Ji rewşa keça kurd Remziye ku bûbû hedefa fêlê pîs ên cerdevanî bigire, heta nameya Zilanê gelek nivîsên li ser jînê kurd jî di vê hejmara Kurdistan Reportê de cih girtine. Dîsa nivîsên li ser Kanî Yılmaz cihekî berfirêh di kovarê de ji xwe re dibînin. Heta di berga paşin a kovarê de jî wêneyê Kanî Yılmaz cih girtiye. Her wekî hejmara din, bîraînê Apê Mûsa yên ku ji pirtûka wî têner wer-girtin, di vê hejmara de jî hatine weşandin. Di Kurdistan Reportê de nivîsa herî balkêş pêşnûmaya Qanûna Bingehîn a Komara Federalî ya Kurdistanê ye. Mirov dikare bibêje ku yekemîn car e ku xebateke bi vî rengî di weşanekê de cih digire. Kovara Kurdistan Report bi îngîlîzi ye, ev kovar li ser kaxizeke bi qelite tê weşandin, bergêne wê rengîn, rûpelên navîn reş û spîne. Hûn dikarin kovarê ji vê navnîşanê bixwazin:

Kurdistan Information Centre (KIC)
10 Glasshouse Yard, London EC1A
4JN Tel: 00 44 171 250 1315
Faks: 00 44 171 250 1317

SERWÎSA ÇANDÊ

Kafka û yên me

MEDENÎ FERHO



Kesayetiya rewşenbîrên kurd bi giştî prehûdiya Kafka ye. Ev rastiyek dojehî nîşanî me dide. Ez vê bîrdozê ne bi çavderiyeke kafkayî tînime ziman. Pûçbûna dil û çewsandina gurçikan, bi giştî têkçûna hinavan e, ku komên xelkê der barê vê bîrdozê de bi hézek berzî pêl vî çînî-dike. Diperçiqne. Çinê pîrbêj, di vê perçiqandinê de bi xwe dihese, lê di nava canêşiyê de dikene. Mîna yariyên pêkenôkî dibûwêre. Lê, di bûwtartina rojane de dem kin e û careke din derdikeve hemberî wan. Yanî, bi gotineke pir mezin jî em dikarin vî navî li wan bikin: Xwe dîtna mîna pêxemberan, lê jîndariyek bendetî. Yek gotin tenê ji bo wan kêm dimîne, ezbenî. Her çîqasî gotina ezbenî di literatûra kurdi de payeberziyek dilovanî û mirovanî bîne ziman jî, di bîngeha xwe de bendetî heye. Gotinek kevnare ye û ji dema bendetiyê gîhaye roja me. Di atmosfereke wiha de oksijen kêm e û karbondioskit pîr e. Her wiha di nava atmosfereke têr karbondioskit de afirandina berhemên têr cewher misrî û qels dimîne. Felûşî, kulokeşî, seşetî, kopîrî, kor û kerendeyî, eblehî û bêhîşî rastmalê masetî ye. Bazırganiyek cihûkî bê sûde ye. Firazeyek têr zîwan, zîyanek bê tîrşeyî dibe navê iro. Pêñûs, rola xwe nalîze. Belgên bi xwînê hatine rengînkirin nexşê nabin. Tevn û hûnandina pêşerojan xîlofatî dimîn. Formulasyonê erzan, têgîhiştinê mezin û bîrdozên ramangîrî dernaxin hole. Teyvera komên xelkê ku, bûye arguniya berbangê, pêdiviya korneke modern a têr aheng derdixe hemberî me tevan. Tu pêdiviya dûrbûn û biyanîtiya wate, merc û hoyê rastiya xwe nîn

e.

Em bêne rayê.
Rewşenbîr ci ye? Kî rewşenbîr e? Gelo karekî wilo heye?

Her sê pîrsan jî, di nava rewşenbîrên kurdan de bersîva xwe ne dîtiye. Çima? Ji ber ku rewşenbîr li xwe xwedî dernakevin. Yekemîn bê rêxistin in, li rêxistinê xwe xwedî dernakevin. Naxwazin ku di nava rêxistinê pîşeyî de jî cihê xwe bigirin. Yanî direvin, baz didin. Reva jîxwe û pîşeyen xwe, reva ji kar û binbariya xwe, reva ji sazî û dezgehîn pîşeyen xwe bêhêzî û bêbawertyî tîne. Mêrê çê di nava kîjan hoyan de be li ber xwe dide, ramenê xwe diparêze, mafê xwê dixwaze. Lewma rewşenbîriya kurdi qels, misrî û bê hêz dimîne. Bêdengîya rewşenbîr û nivîskar û lêkolînê payeberzê kurd jî, wê hêz û kesanetiya wan dikuje. Payeberziya xwe li benda dîrokê dihêlin. Her wiha dîrok jî bi destêni mirovan tê nivîsandin û mîna her şaxê zanîsti di nava hûnandin û avahiya xwe de çewtiyê mezin radigire. Ev çewti û şâsi di hûnandin û avahiya dîroka Kurdistanê de bi her away xuya dibe. Nêzîkbûna dijberî û berberiya gunditî, dexusî û zikreya di navbera komên xelkê de ku kesen herî mezin bi çînê bijartî re ye, van çewti û şâsiyê mezin çareser nake. Yek rê û şîvîle dimîne, guftûgo û gengesiyek dûr û dirêj û axaftina bideng. Bêdengî û nepixandina di ûr de qolincê (janê) tevzînokî dide mirov.

Zimanê kurdi jî wilo.

Zimanê kurdi, di nava berza hûnandina xwe de mîna afzendaka têr nîgarî bersîva her şaxê zanîsti dide. Lî, piştî pazdeh salêr têr berdelî bi xwîn ku rojnamegeriya kurdi bi profesyoneli dest pê kirîye, nebûye xwedî zimanekî pîşeyî. Ew rojnamevanê ku xwe sereke dibînin û nikarin bi kurdi çar peyvan li dûv hêv rîz bikin, çawa wê bibin berdevkê rojnamegeriya kurdi? Bi çend zimanê biyanî dizanîn, ji hindikayî ve bi tirkî û zimanekî din yê ewrûpa dinivîsin, lê bi kurdi nikarin xwe ifâde bikin. Edî şermîti ji vê mezintir! Rojnamevanê mîna Cahît Marwan, Mehmet Aktaş û hwd. çawa dikarin bersivê bidin?

Helbet di nava kesê wilo de nivîskarênu ku xwe kurd dihesibînin û di doza kurdi de gavêne mezin avêtine, lê pîrtûkên xwe bi tirkî, yan jî bi almanî dinivîsin jî hene, ew dikarin ci bersivê bidin? Cahît û Mehmet hevalen min in, lewma min navê wan da. Bila min bibexşînin, heger xwe rojnamevanê gelê kurd dibînin, bêguman gerek e pêdiviya nivîsnâ bi kurdi jî bibînin. Ez dikarin navê nivîskarênu arabesk jî bidim, da ku di nava şermezariyê de tewanbar bibin. Aya, ew nivîskarêku bi du-sê zimanê biyanî dizane, çawa xwe di zimanê zikmakî de ku pêdiviya gelê wî pê heye negihîjîne û fer nabe? Ne salek ne didol... Bêguman ne ew rojnamevan dikarin rojnamegeriya kurdi pêş de bibin, ne ew nivîskar dikarin wêjeya kurdi bi pêş de bibin.

Hê jî heye, berî çend şalan bû, ez û çend mîvan çûne serlêdana serspiyekî xwe. Serspiyê me di nava literatûra çand û wêjeya kurdi de xwedî pênuiseke berz e. Çawa em rûniştina li Ewrûpa û nivîsandina helbestan çenabe. Kevir diavête min û xwe li hemberî hevalêkî din xweşik dikir. Sê pîrtûkên min jî nû hatibûn weşandin. Lî, ez berî du salan, ew jî nêzîkî salekê hatibûn Ewrûpayê. Ez di cihê xwe de mame şas. Yanî em her du jî nû revîa bûn. Lî min xwe zû da hev û bersîva wî da: "Em nivîskarênu kurdi jî şoreşa kurdi jî ne li derî cihanê û ne jî, ji stêra gelawêjê hatine. Weki her kesî, pîrsa me bersîva şoreşê û daxwazên gelê kurdi e. Pêñûs û çek bi hev û dîn re wê serkeftinê bixwemîlinin." Gelo ew serspiyê me iro jî di wê bawriyê de ye?

Mirov dikare mînakan pir bide. Bersîva şikêren mîran û cangoş û canefsanar bi pênuiseke têr xemîl û nîgar, heger bi kurdi neyê dayîn, pêşerojen me ges nabin. Hege rewş ev be û tevgera rewşenbîrên ku çînê bijartî û pîrbêj têne hejmartin wiha biramin, gundi û şîfer û atarek jî wê li hemberî rewşenbîr raweste û bîbêje: "Aydino tew malâ minoş fîz sîl."

Lewma ez dibêjim, divê berî her kesî, rewşenbîrên bersîva pêdiviya li xwe, li sazî û dezgehîn xwe xwedî derketinê, bi hemdemî û bi zimanê ziknakî bibînin û bidin. Prehûdiya Kafka li bejna me tê.

Kerê guh bel û cerdevanên bêzirav



Li gundekî Sêrtê, gundi tev bûbûn cerdevan. Berî ku bibin cerdevan, kesên bêzirav û newêrek-bûn. Her kesî neheqî li wan dikir, wan newêribû li hemberî neheqiyân dengê xwe bikin. Pişti ku tivinga dijmîn digirin ji hedê xwe dertên. Ëdi wan zilmû neheqî li gundê dora xwe dikirin. Her roj li hev jî dixistin. Heta carekê li hev xistin, zilamek mir jin û mîrek jî birîndar bûn. Dixwestin ku nav û dengê xwe bilind bikin.

Îcar şevekê ew çerdevanê han di ko-zika xwe de notirvaniyê dikan. Wê şevê kerê yekî gundî li çolê maye. Derengî şevê ker ber bi gund ve û di ser kozikên cerdevanan de tê. Cerdevan dibînin ku tiştek tê, lê nizanin ku ci ye. Bi hev di-şewirin û ji xwe re dibêjin: ‘Hebe tune-be ew gerîla ne. Heke ku em guleyan berdin wan, wê me bikujin û gundê me ji bişewitînin.’ Cerdevanê bi navê Hecî Fikri dibêje: “Em gazi sercerdevan bikin bila ji gerilayan re bibêje me nekujin, emê tivinga dijmin deynin.”

Gava ku ker nêzik dibé her du guhêñ
kerê tén dítin, ji hev re dibêjin: "Welehi
ew her du lûleyêñ roketê ne. Kuro wele-
hî xelasîya me nîn e." Bi vî rengî xwe

diavêjin nava kozikê, berê tivinga xwe hevraz dîkin ezmana berdidin. Li hem-berê teqandina tivinga, ker qet nasekine hê jî ber bi wan ve tê. Cerdevanek lê di-ke gazî: "Bira! Birayê ezîz! em di bext şeref û namûsa we de ne. Bira bi Xwedê em jî kurd in. Em jî birayê we ne. Em sozê ku jin pê tê berdan didine we ku emê tivingan teslîmê dijmin bikin."

Lê tu deng ji kerê nayê. Dengê tivin-
gên wan û yên qereqolê tevlihev bûne.
Ev cerdevan pişt re direvin, diçin dike-
vin hewşekê nav çelekan. Ji tırsan der-
nayênen heyâ ku dibe sibe. Tev binê xwe
pîs dikin, xwe dilewitînin. Di hewşê de
yek ji xwe çûye, nizane çi xeber dide.
Destê xwe li zikê çêlekê dixe û dibêjê:
“Dayê, dayê avê bide min, ez ji tîna zû-
wa bûm.” Heya serê sibê ji wê hewşê
dernakevin. Serê sibê diçin dertêni dini-
hêrin ku wa li ber kozika wan kerekî bi-
rîndar heye. Tenê guleyek lê ketiye, ew
jî ji hêla qereqolê ve lê ketiye. Ji hev re
dibêjin: “Welehî ev karekî bê namûsî yê
ye. Ji ber kerekî em tev rezil bûn. Em
herin tivinga xwe teslîmî dewletê
bikin.”

CEVAT İNCE

BIXELAT...

XACEPIRSA BIXELAT (79)

XACEPIRSA

Bersiva Xacepirsa 77'an

Xaçepirsa me bixelat e.
Di 15 rojan de ci bersiv
bigihijin me, emê wan
binîrxının û bi riya pişkê li 5
kesan belav bikin. Xelata
hejmara me ya 79'an pirtûka
Beyhani Şahin
(Lêkôlîmekî Qicik Li Ser Zimên)

Jérenot:


*Ji bo ku bersiva we bê
nirxandin, divê hûn
“Peyva Veşarî” di nava
quityên li bin xaçepirsê de
binivîsin û teví navmîşana
xwe ji me re bisînin.*

Pênc kesen ku xelata xacépirsa hejmara 77'an kaseta Ciwan Haco 'Bilîrâ min' qezenc kirine. Mücahit Oğuz/ Sert, A. Doğan/ Amed, Mehmet Altas/ İstenderun, Adem Duluvan/ Gebze, Cem Çam/ Entab.

Pirtuka peyvan		Bi erebi xér hati Naveki tırkan		Pêşeroj		Kovareke kurdi Parkîtek		Nikel Naveki jinan Jin	
Rojnamevan ek (wêne)		6				↓		1	
Wezife, rist	→			Giraniya hewayê Hiç	→				↓
Debeng					↓	Di gulaşê de têk birin Belê	Ji agir Belê		
Bere, cephe		Milli Vin	→		↓		↓	4	3
			↓	Çewal Hêvi	→			Jêderk Bi erebi pêşmér	→
Madekirî	→		↓	Şahê heywanan Bi tirkî kefa dest	→				↓
Tipeke kurdi					↓				
Biwêji	↓	Lakin, fejet	→			Oksijen	Peyveke pirsê		
Gihanekek	→			5		↓	↓		
	↓	Naz	→			(berepas ki) Küçük	→		

PEYVA VESARI





NAVNIŞAN

Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerinendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)

SAMI TAN

Berpirsê Karê

Nivisaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpirsê Saziyê

(Müesseses Müdürü)
TAHIR ELDEMİR

ÇAPXANE

Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN

BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTYÊN ME

(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî
yê Ewrûpayê:
Mazhar Günbat

Tel: 00 32

53 64 12 62

Brüssel

Medenî Ferho

Suriye:

Jan Dost

Helfim Yûsiv

Berlin:

Silêman Sido

49-30-69002695

Hannover:

Selim Biçük

49-5721-81360

Munchen:

Mahmut Gergerli

49-871-670884

Stockholm:

Robin Rewsen

46-8-7510564

Bonn:

Ahmet Baraçlı

49 228 66 62 49

Serokê YNK'ê Celal Talabani:

PDK dixwaze têkçûna xwe bi propagandayê veşêre

Amerika nizane bi ci awayî erdê bin lingên xwe li başûrê Kurdistanê zexm bike. Rewşa aloz a li Rojhilata Navîn û pirbûna hêzên ku dixwazin li ser başûrê Kurdistanê bibin xwedî bandor, nahêle ku Amerika li gorî dilê xwe bimeşe. Bi tevgera dagirkirinê ya li ser başûrê Kurdistanê agirbesta ku bi zora Amerikayê pêk hatibû, têk çû. Li hinek cihan ser di navbera PDK û YNK'ê de derket. Her wiha xurtbûna PKK'ê li başûrê Kurdistanê, Amerikayê dixe nav metirsiyeke mezin.

Lewre jî Amerikayê serokê rôxistinê kurd vexwendin Washingtonê, li ser vê bangê Serokê YNK'ê Celal Talabani, hefteya çûyi li Amerikayê bû. Di civînê ku bi rayedarîn amerîkî re hatine kîrin de, dîgel gelek mijarîn din, têkiliyê bi PKK'ê re jî hatine rojê. Talabani pişti civînê, bersiv da pîrsên rojnamegerên tîrk jî. Em van pîrs û bersivan zu di rojnameya Turkish Daily News de cih girtin diweşînin.

Civîn çawa diçin?

Civînê bi birêz Talbott û birêz Pickering re gelekî bas derbas bûn. Me civîneke gelekî bas û erêni pêk anî. Bi giştî em li ser rewşa Iraq û Kurdistanâ Iraqê axivîn. Me dîtinê xwe ji hev re gotin. Em bi tevahî di nîrxandînê li rewşa Iraqê û Kurdistanâ Iraqê de di heman baweriyê de ne.

We li ser binpêkirina agirbeste jî xebîr da?

Em li ser agirbest û aramîyê peyivîn. Em li ser aşî û ewlehiya sînorê Tîrkiyeyê peyi-

vîn. Em li ser her tişî peyivîn.

Hûn li ser PDK'ê jî peyivîn?

Na, ji xeynî PKK'ê.

Cîma?

Lewre tu sedem tune ji bo vê yekê, ji ber ku mijara me arîşeyen Iraqê bûn.

Wekî din hûn li ser ci peyivîn?

Me dîtinê xwe li ser tevgera dijber a Iraqê û gelê Iraqê anîn zîmîn. Em hêvî dikin ku Amerîka bi awayekî vekirî ji bo Iraqê yekgirtî û demokratîk, piştgiriya gelê Iraqê û tevgera dijber a Iraqê bike. Ne ku bi hin çalakîyên nehêni...

Iro me bîhist, dibe ku Amerîka alîkariyê bide kurdên Iraqê?

Ez jî wîsa hêvî dikim.

Lê pişti ku artêşa tîrk ji herêmê derket, PKK'yi li her derê ne. Heta bi sedan kilometre dûrî herêma ku em lê ne jî PKK'yi hene ku em bi tu awayî nikarin alîkariya wan bikin. PDK dixwaze bîketina xwe bi propagandayê veşêre.

Wê ev alîkari çîqas be?

Ez nizanim, ji ber ku ev hê civîna mîne ya yekemîn e. Wê civînê me bidomin. Em hêvî dikin ku ev alîkari wê bi qasî ku imkan heñe, pir be.

Hûn ji ber ku tevî PDK'ê êrişî ser PDK'ê dikin, tîn sîcdarkirin?

Ev. yek ne rast e. Me ji birayê xwe yên



tîrk xwest ku werin bi çavên xwe rastiyê bibînin. Heke ew herin herêmê wê bi xwe jî bibînin ku ev gotin ne rast in. Em tevî PDK'ê besdarî tu çalakiyan nabin. Ev propagandaya PDK'ê ye, lewre ew li hemberî PDK'ê têk diç. PDK dixwaze bi vî awayî têkçûna xwe veşêre. Lewre jî ew gelek propagandayan dikin û dibêjin: "Me PDK têk bir." Lê pişti ku artêşa tîrk ji herêmê derket, PKK'yi li her derê ne. Heta bi sedan kilometre dûrî herêma ku em lê ne jî PKK'yi hene ku em bi tu awayî nikarin alîkariya wan bikin. PDK dixwaze bîketina xwe bi propagandayê veşêre. Em bi tu awayî alîkariya PDK'ê nakin.

Gelo rayedarên amerîkî alîkariya ku YNK'ê ji Iranê girt, anî rojêvê.

Hevalên amerîkî rewşa giran ku em tê de ne fêm dikin, lewre em bi birayê tîrk, erêb û Iranî re li kêleka hev dijin.

Ferhengok

ne-aramî: bê îstîkraî

neguhêrbar: tişte ku naguhere

neyîkîrin: redkirin

nîse: têbînî, not

parîkî: paşpirtik, paşgir (sonek)

pêrîkî: pêşpirtik, pêşgir (önek)

pênas: ünvan

pirbare: tekrarkirin

pîrsîyâkîrin: dan ber pîrsan (sorgulamak)

ramyârî: siyasi

raperîn: serhîdan

ravekîrin: izahkirin

rawe: hat, (kip)

rader: mastar

rêpîvan: qaîde

rûbar: çem

qutîfîn: tîrsîn, bizdîn

sergîhayî: temam

teqez: misoger, qethî, mitleq

tekûz: bêkemâsi, komple

tîpguhêzî: trankîpsiyon

verxwendin: dawetkîrin

xewnereşk: kabûs

zayendi: cinsî

The Middle East:

Operasyona artêsa tirk bû Fîasko

Li hemberî propagandayê dewleta tirk ên serkeftibûna operasyonan jî heman çavdêr dibêje: "Heke ew operasyon ew qas serkefti bûna, diviyabû berî çend salan li bakurê Iraqê dawiya PKK'ê bihata." Di nivîsa navborî ya The Middle East de tê diyarkirin ku di dema tevgera artêsa tirk a li Başûr de, çalakiyên gerila yên li Bakur zêde bûne.

SAMÎ BERBANG

Kovara The Middle East di hejmara xwe ya dawîn (hejmara meha tîrmeh û gelawêjê) de nîseke berfireh li ser tevgera dagirkirinê ya artêsa tirk weşandiye. Li gorî pêşka nîvîsê, amadekarê vê nîvîsê Roddy Scott, ji çend rojnamegeran bûye ku pişti tevgera dagirkirinê li herêmê, maye.

Nîvîs bi vê nirxandinê dest pê dike: "Kurdên Iraqê jî besdarî vê tevgera artêsa tirk a li ser herêma kurd a bakurê Iraqê bûn. Lî operasyon negihîst armanca xwe, nekaribû PKK'ê jî herêmê derxe. Li aliyê din dibe ku ev tevgera tevahiya herêmê bixe nava ne-aramiyê (bêistiqbarî)."

Li gorî nirxandina Roddy Scott vê dagirkirina Tirkîyeyê her wekî dihat texmîn kirin, du tişt bi xwe re anîne: Berteka (reaksiyon) tûj a ereban û bi lezgînî ji herêmê vekişîna PKK'ê. Nîvîskar ji bo berteka ereban gotinê Cigirê Serokê Sûriyeyê Abdil Halîm Xaddam nîşan dide. Xaddam dibêje: "Ev yek dagirkirin û vegirtina erdê ereban e. Ev tiştî bi xetere ye ji bo hemû wela-têr erek, êdî rengê rejîma wan ci dibe, ew zane." Nîvîskarê The Middle Eastê wekî nimûneya helwesta dewletêne ew-tûpî jî gotinê Wezîrê Karê Derve yê Îngîlistanê Doug Henderson dide. Henderson pişti ku piştgiriya xwe ji bo "parastina yekparetiya erdê Tirkîyeyê" diyar dike, gotina xwe wiha didomîne: "Lê em ne bawer in ku kêşeya başûrê rojhîlat bi riya ser çareser bibe. Her wiha em girîngiya hurmeta ji bo ma-fen mirovan bi bîra dewleta tirk di-xin û em ji wê dixwazin ku ji kiri-nîn li dijî kesen sivil birevin."

Di nîvîsê de tê gotin ku berî vê du carê din jî artêsa tirk leşker kîşandine herêma kurdan û bi taybetî di sala 1995'an de leqayî rexneyên tûj hatine, ji ber tadeyên ku li gel kirine. Li gorî nîvîskar Tirkîyeyê, ji bo ku îcar nekeve heman rewsê, dayezanîn ku PDK'ê ew vex-wendîte herêmê.

Hejmarênu ku dewleta tirk dide dûrî rastiyê ne

Nîvîskarê kovarî li ser agahiyêner fermî yên dewleta tirk jî vê nirxandinê dike: "Kuştina 1800 gerîlayen PKK'ê ku ji hêla rayedarên tirk ve wekî nîşana serkeftina operasyonê tê nîşandayîn jî tijî şik û guman e. Lewre, bi hatina artêsa tirk re hemû rojnameger ji herêmê hatin dûrxistin, vê yekê jî nehişt ku hejmarênu

fermî yên Tirkîyeyê ji hêla çavkaniyê serbixwe ve bêr pirsiyarkirin."

Nîvîskarê kovara navborî têkçûna operasyonê bi vê nirxandina rojnameya Partiya Baasê Al Thawra tîne zimên: "Bêguman ev têkçûneke mezin e û ev cure têkçûn heta ku rayedarên tirk çare-serkirina arîşeyen xwe yên ewlehi di vê riyê de bibînin, wê pirbare (tekrar) bîbin."

Li gorî idîaya-nîvîskar gerila berî artêsa tirk ji herêmê derketine û lewre ji li kêm cihan ser derketiye. Nîvîskar vê ditina xwe jî bi gotinê Samî Abdurrahman ve girê dide. Bi awayê ku ew dibêje Samî Abdurrahman gotiye PKK ji herêmê derketiye, lê i c a r e w ê n e - h ê - lin

hatine kuştin.

PDK'ê ji şer zêdetir propaganda kir

Tiştî cihêreg yê di vê nîvîsê de jî nirxandina li ser propagandaya PDK'ê ya li dijî PKK'ê ye. Roddy Scott idîaya PDK'ê ya di warê bazirganiya narkotikê de dişibîne gotinê dewleta tirk û didezanîn ku PDK'ê ji şer bêhtir dest avetiye propagandayê. Her wiha tê gotin ku PDK'ê her roj mirov derxistene televizyona xwe bi wan daye gotin ku PKK'ê ew bi darê zorê ji malên wan derxistene.

Piştî ji PDK'ê propagandaya bi renge "PKK zarakan direvîne û dibe wekî gerila perwerde dike."

hêzên tirk ji herêmê dûr dikevin, PKK'ê vedigere cihê xwe yê berê. Li hemberî propagandayê dewleta tirk ên serkeftibûna operasyonan jî heman çavdêr dibêje: "Heke ew operasyon ew qas serkefti bûna, diviyabû berî çend salan li bakurê Iraqê dawiya PKK'ê bihata." Di nîvîsa navborî ya The Middle East de tê diyarkirin ku di dema tevgera artêsa tirk a li Başûr de, çalakiyên gerila yên li Bakur zêde bûne.

Li ser şerê Kurdistanê bi giştî jî ev nirxandin tê kirin: "Şerî PKK'ê û dewleta tirk rojhîlatê Tirkîyeyê kavîl kir Zêdetirî 20 hezar kes hatine kuştin, bîhezaran gundi bûn penaberê hundirin. Hêzên tirk gundi vala kirin, ji bo ku piştgiriya lojistik û xwarinê ji gerila qut bikin, digel vê yekê û bicikirina 200 hezar leşkeren tirk li herêmê, tu nîşanêne têkçûna PKK'ê li holê nîn in."

Agirbesta Amerîkayê di xeterê de ye

Hinek dîplomatên ku nîvîskar pê re axiviye, metirsîya xwe anîn zimên Lewre li gorî dîtina wan dibe ku mayîna hêzên tirk li Başûr bibe sedema faşîlbûna agirbesta PDK û YNK'ê. Li gorî çavdêriyê nîvîskar agirbesta heyî bi zora Amerîkayê pêk hatiye, lê tu nîşanen aştîyeke domdar xuya nakin. Sedema vê yekê jî bi wan gotinê dîplomatik tê râvekirin: "Cudatiyeke mezin di navbera herêma di bin destê Talabanî û Barzanî de heye. Herêma Talabanî ji çaran sisîyê hemû herêmê pêk tîne, lê bi tenê ji çaran yekê dahatuya herêmê jê re diçe Li aliyê din Barzanî ji çaran yekê herêmê kontrol dike, lê ji çaran sisîyê pereyên ku ji herêmê re tê, bi dest dixe Xuya ye ku statûkoya heyî wê tu car jî hêla Talabanî ve neyê pejîrandin."

Li gorî nirxandina heman dîplomatîku The Middle Eastê berî nîvîsî bi hefteyekê pê re peyiviye, hevkariya PDK'ê bi Iraq û Tirkîyeyê re, wê rêxistinê jî gel dûr dixe û ew jî bingeha êrîşekî YNK'ê ya li ser Hewlîrê xuri dike. Ew dîplomat xewnereşka xwe jî di hevkariya PKK û YNK'ê de dibîne û wiha dibêje: "Heke ew yek pêk were, divê emîş tûrîk û çenteyen xwe berhev bikin û vegerin mal."

Di nîvîsê de nebûna xistina firokeyêne tîrkan bi moşekîn gerila ku li seranserî cîhanê geleki deng vedabû û êrîşen gerila yên li ser hêzên tirk û PDK'ê ji bo nîvîseke bi vî rengî qelsî ye. Lê dîsa jî ew nîvîs bi awayekî zelal bi serneketina artêsa tirk li hemberî gerila diyar dike.

